ENCAM

NEDADWERÎ, ÎŞKENCE Û MIRIN LI BAKUR-ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

AMNESTY INTERNATIONAL

Rêxistina Efûya Navneteweyî tevgereke 10 milyon mirovan e ku mirovahiya di hundirê her kesî de û kampanyayan dixe nav tevgerê da ku em hemî bi mafên xwe yên mirovî bi kêfxweşî bijîn.

Nêrîna me derbarê dinyayeke wisa ye ku yên xwedî desthilatî li ser sozên xwe rawestin, ji hiqûqa navneteweyî re rêzdar bin û bibin berpirsiyarên kiryarên xwe.

Em ji hikûmetan, ji îdoelojiyên siyasî, ji berjewendiyên aborî an jî ji dîn û baweriyan serbixwe ne û em alîkariyê bi tenê ji endamtiyên xwe û ji bexşandinên takekesî distînin.

Em di vê baweriyê de ne ku çalakiyên ji bo piştgiriyê û girêdana bi mirovan re dikare civaka me ber bi başiyê ve biguherîne.

© Rêxistina Efûya Navneteweyî 2024
Ji bilî cihê ku berevajî hatibe destnîşankirin, naveroka vê belgeyê di bin lîsansa Creative Commons (têkildarî, ne-ticarî, ne-dariştî 4.0) de tomarkirî ye. https://creativecommons.org/licenses/by-nc-nd/4.0/legalcode

Ji bo zêdetir agahiyan ji kerema xwe di vê malpera webê de serlêdana rûpela destûran bikin:
www.amnesty.org

Li cihê ku xwediyê materyalan li şûna Rêxistina Efûya Navneteweyî saziyeke din be, wê demê ew nakevin ber parastina lîsansa Creative Commons.

Cara yekem di sala 2024an de hat weşandin ji hêla Amnesty International Ltd
Peter Benenson House, 1 Easton Street, London WC1X 0DW, UK

PÊRIST: MDE 24/7752/2024
ZIMANÊ RESEN: ÎNGILÎZÎ

amnesty.org

Wêneya bergê:
Zarok, jin û mêr ji aliyê rayedarên xweser ên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ve bi awayekî keyfî tên desteserkirin. Wêne ji hêla Colin Foo ve © Rêxistina Efûya Navneteweyî

AMNESTY INTERNATIONAL

NAVEROK

NEXŞE	**IV**
KURTEYA RÊVEBER	**5**
RÊBAZ	**25**
ENCAM Û PÊŞNIYAZ	**32**
PÊŞNIYAZ	**35**

NEXŞE



Nexşe kampên sereke yên desteserkirinê, avahiyên desteserkirinê û baregehên hevpeymanê ya bi pêşengiya DYê yên li bakur-rojavayê Sûriyeyê ku di vê raporê de derbas dibin nîşan dide.

KURTEYA RÊVEBER

Hevkarê sereke yê hikûmeta Dewletên Yekbûyî (DY) yê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî berfireh û sîstematîk mafên zêdetirî 56,000 mirovên ku di destê xwe de digire bin pê dike.

Di nav van mirovan de Sûriyeyî, Iraqî û hemwelatiyên biyanî yên ji 74 welatan hene. Piraniya wan di dawiya sala 2018an û destpêka sala 2019an de li dema şerên dawî yên bi "Dewleta Îslamî" (DAIŞ) re ketin nav destê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD). Ew mirov niha di toreke berfireh a herî kêm 27 navendên desteserkirinê û du kampên desteserkirinê de tên ragirtin.

Ev pergala desteserkirinê ji aliyê Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê rêvebirin (di vê raporê de wekî rêveberiyên xweser hatiye binavkirin), ku ji komek çekdar a nedewletî ya bi navê HSD; ji hêzên ewlehiyê yên din ên girêdayî HSDê ku di nav wan de Hêzên Ewlekariya Hundirîn (HEH); û baskê sivîl ê HSDê jî hene û ji Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê (RXDBRS) pêk tê.

Mêr, jin û zarok li avahiyên girtinê, ku ji aliyê HSDê û hêzên ewlekariyê yên girêdayî wê ve tên rêvebirin, bi awayekî keyfî û nediyar tên girtin û bi darê zorê tên windakirin. Gelek ji van girtiyan di şert û mercên nemirovane de hatine ragirtin û rastî îşkence û tevgerên xirab hatine, ku di nav de lêdana bi tundî, girtina di rewşên tijî tengeje de, dayîna şokên elektrîkê û tundiya zayendî jî hene. Li Kampa Siniyê ku yek ji van navendan e, girtî bi hovîtiyeke bêdawî re rû bi rû dimînin: destdirêjiya fizîkî ya rojane; biçûkxistin; nedana xwarinê, nedana avê, bêparhiştina ji lênêrîna bijîşkî û pêdiviyên din ên bingehîn nimûneyên wan hovîtiyan in. Ev yek bûye sedema mirina bi sedan mirovî. Li navendeke din a bi navê Panoramayê jî, mêr û civan nexweşiya berbelav û nedermankirî ya weremê dikişînin, ku di sala 2023an de bû sedema mirina her hefte herî kêm yek an du girtiyan.

Mirovên ku li her du kampên bi navê El-Hol û Rojê tên girtin ku ji aliyê rêveberiyên xweser ve tên rêvebirin, bi awayekî keyfî û demnediyar û di nav şert û mercên nemirovane de û bi xetereya jiyanê tên ragirtin. Jin û zarokên wan bi darê zorê ji hev tên veqetandin. Zarokên ku welatiyên biyanî ne dema mezin dibin wan ji kampan derdixin û dibin navendên desteserkirinê, ku di nav de navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan jî heye, û îhtîmala derketina ji wan navendan jî kêm e. Jinên ku bi sedema kiryarên nebaş û ji ber hin sûcan ji kampan vediguhêzin navendên desteserkirinê, gelek caran neçar dimînin ku zarokên xwe li dû xwe bihêlin, bê ku ji bo amdebûnê maweyeke guncav bidin wan.

Ev pergala desteserkirinê ya ku piştî sûcên DAIŞê li gor hiqûqa navneteweyî hat avakirin, mafên bi deh hezaran mirovan bin pê dike. Her wisa tu dadweriyê jî ji hovîtiya DAIŞê re peyda nake. Di nav wan mirovên ku hatine girtin de qurbaniyên DAIŞê jî hene. Bi sedan Êzdiyên ku bûne qurbaniyên hovîtiyên DAIŞê di nav wan girtiyan de cih digirin. Pareke mezin a jin û keçên girtî jî qurbaniyên zewaca bi zorê ya bi endamên DAIŞê re ne, û gelek kurik û mêrên ciwan ên girtî jî qurbaniyên leşkerkirina zarokan a ji hêla DAIŞê ne. Pergala desteserkirinê nekarî dadwerî û hesabpirsînê ji bo qurbanî û kesên ji DAIŞê rizgarbûyî re dabîn bike, ku di nav wan de sûcên şer, sûcên li dijî mirovatiyê û kiryarên li dijî civaka Êzdî yên li Iraqê hene ku li gor NYê di asta komkujiyê de bûn. Qet yek mirovê ku bi vê pergala desteserkirinê hatiye girtin heya niha wekî berbirsê wan sûcan nehatiye nîşandan.

Hikûmeta DYê û endamên din ên hevpeymaniya leşkerî ya ku ji bo têkbirina DAIŞê hatiye avakirin, roleke girîng di damezrandin û piştgirîkirina vê pergala desteserkirinê de lîstin, lê nekarîn piştrast bikin ku ev pergal li gor pîvanên mafên mirovan ên cîhanî yên pejirandî bimeşe. NY xwedî roleke sînordar e li bakur-rojhilatê Sûriyeyê, ew kamp û avahiyên desteserkirinê jî di nav de hebûn û çalakiya NYê ya li wê li herêmê girêdayî razîbûna bisînorkirî ya hikûmeta Sûriyeyê ye. Di encamê de, berpirsiyariya rêvebirina vê pergalê bi giştî dikeve ser milê rayederên xweser û ew rayedarî jî aktorekî nedewlet e, xwedî çavkaniyên kêm e û di çarçoveya aloziyên domdar de tevdigere.

Rêxistina Efûya Navneteweyî lêkolîn li ser rewşa wan mirovan kir ku bi angaşta tawanbariyê ya pêwendiya bi DAIŞê re li kamp û avahiyên girtinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ew nêzîkî du salan e, ji Adara 2022an heya Sibata 2024an, tên girtin. Rêxistinê ji bo vê raporê bi 314 mirovan re hevpeyvîn çê kir. Lêkolîner sê caran çûn bakur-rojhilatê Sûriyeyê, ji 24ê Îlonê heya 8ê Cotmeha 2022an, 25ê Sibatê heya 11ê Adara 2023an, û ji 27ê Tîrmehê heta 6ê Tebaxa 2023an ev serlêdan pêk hatin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî ji bo hevkariya rayedarên xweser kêfxweşiya xwe tîne ziman ku wan daxwazên berfireh ên rêxistinê pejirandin, ji bo pêkanîna hevpeyvînên nehênî yên li 10 navendên desteserkirinê û li her du kampên desteserkirinê derfet çê kirin û her wiha danûstandina wan erênî bû ji bo çareserkirina binpêkirinên demdirêj.

Di dema hevpeyvînên rû bi rû de yên ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatin kirin, û her wiha bi rêya hevpeyivînên ji dûr ve, rêxistinê bi giştî li gel 126 kesên tawanbarê bi girêdana DAIŞê re axivî. Ew mirov an niha yan jî berê li navendên desteserkirinê yan jî li kampan girtî bûn. Ji bo nasnameya veşartî ya van şahidan biparêze, Rêxistina Efûya Navneteweyî hemû navên wan guhertiye navên cihê, û di gelek rewşan de temenê wan û her wiha netewe û cihên wan ji holê rakiriye.

Rêxistina Efûya Navneteweyî ji bilî wan kesan li gel 39 nûnerên rayedarên xweser, 53 xebatkarên rêxistinên sivîl ên neteweyî û navneteweyî û 23 nûnerên saziyên Neteweyên Yekbûyî re jî hevpeyvîn çê kirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî di heman demê de bi 17 berpirsên hikûmeta DYê re li ser esasê nepenîbûnê axaftin pêk anîn û ji ber mercên nepenîmayînê jî di raporê de behsa van nîqaşan nehatiye kirin.

Li gor daneyên vê lêkolînê, Rêxistina Efûya Navneteweyî gihîştiye vê encamê ku rayedarên xweser binpêkirinên cidî yên mafên mirovan û qanûnên mirovî yên navneteweyî pêk anîne ku hin ji wan sûcên şer in. Di nav wan binpêkirinan de, windakirina bi zorê, girtin û binçavkirina keyfî, bêparhîştina ji jiyanê û tundiya zayendî hene, û her wisa sûcên şer ên wekî îşkencekirin, tevgera hovane, û binpêkirina rûmeta kesane jî hatine peyitandin. Diyar e ku rayedarên xweser jî li avahiya desteserkirinê ya Kampa Siniyê beşdarî sûcên şer ên wekî kuştinê bûne.

Ev nêzikî deh salan e ku hikûmeta DYê bi gelek dewletên din re bi awayekî hevpar kar dike da ku piştgiriya HSD bike di şerê wê yê dijî DAIŞê de. Di sala 2014an de Wezareta Parastinê ya DYê Hêza Hevbeş a Peywira Hevpar- Tevgera Biryardariya Xwezayî (di vê raporê de wekî hevpeymaniya bi pêşengiya DYê tê binavkirin) damezrand da ku «rûxandin û tunekirina» DAIŞê ya li Iraqê û Sûriyeyê pêk bîne. Di gel ku ev hevpeymanî ji aliyê teknîkî ve ji 29 dewletên ku hêzên xwe beşdar dikin pêk were jî, pisporekî Sûriyeyê ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re ragihand ku bi tenê hêzên sê dewletan li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hene, ku herî kêm %90 ji wan hêzên DYê ne. Hikûmeta DYê heya roja îro endamê herî bibandor ê koalîsyonê ye, û pêşengiya stratejî, pîlansazî, çavkanî, biryargirtin û pêkanîna mîsyonan dike.

Rêxistina Efûya Navneteweyî destnîşan dike ku hukûmeta DYê wisa diyar e ku berpirsiyariyên xwe yên li gorî Xala Hevbeş 1 a Peymana Cenevreyê bin pê kiriye da ku rêzdariya rayedarên xweser a ji qanûna mirovî ya navneteweyî re misoger bike. Diyar e ku DY li cihên ku beşdarî operasyonên hevbeş bûye yan jî agahiyên îstixbaratî pêşkêşî HSD û hêzên ewlekariyê yên girêdayî wê kirine ew qanûn bin pê kiriye ku di encamê de mirovên bi têkiliya li gel DAIŞê tên tawanbarkirin hatine girtin. Di wan bûyeran de, wisa diyar e ku DYê zanibûye kesên ku ji hêla hêzên ewlehiyê ve hatine girtin dê rastî kiryarên dijî hiqûqê bên ku di vê raporê de hatine belgekirin.

DY û hin endamên din ên koalîsyonê, Brîtanya jî di nav de, diyar e ku di warê piştgirîya aborî û madî de ya ji bo avahiyên desteserkirinê û kampan peywirên xwe bin pê kirine. Di gel ku DYê û hêzên din hewl dabin ku şert û mercên girtinê baştir bikin an binpêkirinan sivik bikin jî, piştgirîya wan di heman demê de alîkariya damezrandin û berfirehkirina vê pergala desteserkirinê kir ku tê de binpêkirin zêdetir bûn.

Di encamê de, DYê nekariye bandora xwe teqez bi kar bîne da ku rayedarên xweser li gor qanûnên mirovî yên navneteweyî tevbigerin. DYê bi hevhariya li gel hevpeymaniya berfireh re hin gav avêtin û ev jî nîşan dide ku hewldanek heye ji bo ku binpêkirinên berdewam çareser bike. Di nav van gavan de alîkariya aborî û piştgiriya teknîkî ya ji bo baştirkirina şert û mercên avahiyên desteserkirinê û kampan, dayîna hîndariyan ji bo hêzên ewlekariya navendên desteserkirinê û kampan, û hêsankirina vegera welatiyên biyanî ya ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê hene. Lê dema mirov wan hewldanan datîne li hember mezinahî û giraniya binpêkirinên ku di vê raporê de hatine vegotin û hêza bandor û derfetên DYê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê, diyar dibe ku gavên bi vî rengî têrê nakin.

Rêxistina Efûya Navnetewî di heman demê de destnîşan dike ku hikûmeta DYê mafên gelek mirovên di bin kontrola xwe de bin pê kiriye, ku di nav wan de mafê jiyanê, parastina wan a ji îşkeceyê û tevgerên xirab

û kiryarên din jî hene, û her wisa diyar e ku DYê prensîba hiqûqa navneteweyî ya nevegerandinê jî bin pê kiriye. Rêxistina Efûya Navnetewî di encama çavdêriyên xwe de dît ku hikûmeta DY wisa diyar e ku di sê rewşan de ev prensîb bin pê kiriye: ya yekem, rayedarên DYê kesên ku li baregehên xwe yên leşkerî ji bo lêpirsînê digirtin piştre ew radestî HSDê kirin; ya duyem, wan mirovên Iraqî radestî rayedarên Iraqî kirin; û ya sêyem jî, wan mirovên Saudî radestî rayedarên Erebistana Saudî kirin.

Di 8ê Adara 2024an de, Rêxistina Efûya Navneteweyî encamên sereke yên ku di vê raporê de hatine diyarkirin bi nameyan ji rayedarên xweser re û her wiha ji Wezareta Derve ya DYê û Meclîsa Ewlekariya Neteweyî ya DYê re ragihand. Ji bilî wan nameyên dîtir jî di 11ê Adarê de ji Wezareta Parastinê ya DYê re, di 12ê Adarê de ji Ofîsa Karên Derve, Yekîtiya Gelan û Pêşketinê ya Brîtanyayê re, û di 21ê Adarê 2024 de ji Serokwezîrê Iraqî re hatin şandin. Rêxistina Efûya Navneteweyî her wisa li gel hikûmeta DYê û rayedarên herêma xweser hevdîtinên kurt pêk anîn û di wan hevdîtinan de çavdêrî û delîlên xwe pêşkêş kirin û derfet dîtin ku pirsan li wan bikin û guh bidin bersivên wan. Bersivên nivîskî ji rayedarên xweser û hikûmetên DYê, QYê û Iraqê hatin wergirtin. Bersivên wan li seranserê vê raporê têne referans kirin û di dawiya raporê de bi tevahî di çar pêvekan de cih digirin.

Bersiva rayedarên xweser şert û mercên dijwar ên ku ew pê re rû bi rû dimînin, pevçûnên çekdarî yên domdar jî di nav de, ronî kir. Wan rexne li "civaka navneteweyî û hevkarên gerdûnî" kirin ji ber ku "peywirên xwe yên qanûnî û exlaqî bi cih naynin", û diyar kirin ku welatên ku hemwelatiyên wan di pergala desteserkirinê de ne û civaka navdewletî ew li hember DAIŞê "bi tenê hiştine ku bi encamên şer re mijûl bibin".

Bersiva Wezareta Derve ya DYê hewldanên DYê yên ji bo çareserkirina "kêşeyên mirovî û ewlekaryê yên dijwar" li bakur-rojhilatê Sûriyeyê destnîşan kir. Wê bang li hemû aktoran li Sûriyeyê kir, HSD jî di nav de, da ku "mafên mirovî biparêzin", û got ku ew bi kom û kesên di nav HSDê de "ku bi awayekî guncaw hatine kontrolkirin" xebatê dike. DYê got ku tekane çareserî " vegerandina kesên bêcihûwar û girtiyan a ji bo welatên wan yên jêder e", da ku sûcdar "ji ber sûcên xwe, li gor mafên xwe yên darazî, berpirsiyar bên dîtin".

Hikûmeta DYê ji bo têkbirina DAIŞê bi HSDê re hevkarî kir. Piştî pênc salan, hikûmeta DYê hîn jî piştgiriyê dide pergala desteserkirinê ku tê de HSD binpêkirinên giran ên qanûnên navneteweyî pêk tîne. Di hin bûyeran de, DY bi xwe dibe kiryarê binpêkirinan. Divê ev binpêkirin bi dawî bibin.

Divê HSD û hêzên girêdayî wê demildest dev ji îşkencekirina mirovên di girtîgehan de berdin û şert û mercên nemirovane yên ku bûne sedema mirina girseyî û her wiha êş û azarên giran çareser bikin. Wekî hêzeke berpirsiyar divê hevpeymaniya bi pêşengiya DYê bi hemû hêza xwe rê li ber van binpêkirinan û binpêkirinên din ên rayedarên xweser bigire. Heya ku binpêkirinên bi vî rengî neyên çareserkirin, divê koalîsyona bi pêşengîya DYê radestkirina bersûcan a ji bo pergala desteserkirinê ya li bakur-rojhilatê Sûriyeyê rawestîne. Heya ku rayedar karibin nîşan bidin ku ew zilam di bin metirsiya binpêkirinan de

nîn in û çavdêriyek têr hebe ji bo şopandina çarenûsa wan mirovan, divê rayedarên herêma xweser û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê divê radestkirina mirovên Iraqî û Saudî ya ji bo welatên wan rawestînin.

Piştî van gavên lezgîn, divê hikûmeta DYê dev ji şopandina rayedarên xweser bernede da ku binpêkirinên di pergala desteserkirinê de rawestînin, lewre DYê piştgirî daye vê pergalê û derfeta sazbûn û domandinê jê re çê kiriye. Pêwîst e ku hikûmeta DYê, hevpemaniya bi pêşengiya DYê û rayedarên xweser stratejiyek berfireh pêş bixin ji bo çareserkirin û nehiştina binpêkirinên giran ên ku li dijî mêr, jin û zarokan li navendên desteserkirinê û li kampên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê pêk tên.

KÎ DI NAV PERGALA DESTESERKIRINÊ DE YE

Rayederên herêma xweser zêdetirî 60,000 kesan li herî kêm 27 avahiyên desteserkirinê û du kampên desteserkirinê digirin. Di vê raporê de peyva “avahiya desteserkirinê “ ji bo avahiyên ku tê de kesên bi hinceta têkildarbûna bi DAIŞê girtî ne tê bikaranîn, û peyva “kampa desteserkirinê” ji bo kampên El-Hol û Roj tê bikaranîn.

Di Tebaxa 2023an de rayedarên xweser nêzikî 10,000 mirov di 27 avahiyên desteserkirinê de digirtin, di nav de du navendên “rehabîlîtasyonê” yên ciwanan jî hebûn. Piraniya van kesan mêr in, lê bi giştî derdora 1,000 kur û mêrên ciwan ku di destpêkê de wekî kurikên biçûk hatibûn binçavkirin û zêdetirî 100 jî jin di wan wargehan de dijîn. Di Berfanbara 2023an de, rayedarên xweser nêzî 46,600 kes di du kampên desteserkirinê de digirtin. Piraniya van kesan jin û zarok in. 29,000 zarokên li kampan dibe nimûneya bi hejmara herî zêde ya li cîhanê ya zarokên ku bi awayekî keyfî ji azadiya xwe hatine bêparkirin.

Di vê pergala desteserkirinê de mirovên ku bi astên cuda yên girêdayîbûna bi DAIŞÊ re yan jî negirêdayî bi DAIŞê tên girtin. Hejmarek nediyar a mirovên desteserkirî jî li gor qanûnên navdewletî sûc pêk anîne an jî di nav Xîlafetê de xwediyê peywirên desthilatiyê bûne. Lê belê, hejmareke mezin ji wan kesên ku di pergala desteserkirinê de hatine girtin qurbaniyên sûcên hovane yên DAIŞê an jî qurbaniyên bazirganiya mirovan in ku di nav de jinên ku bi zorê ji aliyê endamên DAIŞê ve hatine zewicandin û kurikên ku ji aliyê koma çekdar ve neçarî şerkirinê bûne jî cih digirin. Gelek ji wan mirovên ku di kamp û avahiyên desteserkirinê de tên girtin tu têkiliya wan bi DAIŞê re tune. Hejmara wan mirovan bi hezaran Sûriyeyî û Iraqî ne ku berî şerên dawî yên bi DAIŞê re li kampa Holê bûn û ji pevçûn û berfirehbûna DAIŞê reviyabûn.

ROLA HIKUMETA DEWLETÊN YEKBÛYÎ Û REWŞA LI BAKUR-ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

Hikûmeta DYê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê di piraniya pergala desteserkirinê de ya ji bo kesên bi têkildariya DAIŞê re tên girtin hêzeke beşdar e. Ev nêzikî deh salan in hikûmeta DYê bi qasî sedan mîlyon dolaran pêşkêşî HSDê kir. Li gel piştgiriya pereyî û leşkerî, DY û endamên din ên hevpeymanê bi awayekî berbiçav tevkarî HSDê bûn ji bo têkbirina herêmî ya DAIŞê ya 2019an. Dema ku bi deh hezaran mirov bi rêya

korîdorên alîkariya mirovî ji herêmên dawî yên di bin destê DAIŞê de derketin û ji hêla HSDê ve hatin girtin, hevpeymana bi pêşengiya DYê bi komkirina navên mirovan, bi daneyên biyometrîk û di hin rewşan de jî bi rêya veqetandina komên mirovan a li gor temen, welatîbûn û zayendê di pêvajoya vekolînê de bû alîkar da ku ew li navendên desteserkirinê bên girtin.

Piştî têkçûna DAIŞê ya herêmî, hevpeymana bi pêşengiya DYê operasyonên leşkerî bi HSDê re berdewam kir, ku di encamê de bi sedan mirovên nû ketin nav pergala desteserkirinê. Hevpeymana bi pêşengiya DYê li ser gelek girtiyên di destê HSDê de lêpirsîn çê kir, bi taybetî hemwelatiyên biyanî, û li gor HSDê hevpeymanî xwediyê daneyên biyometrîk ên her mêr, jin û zarokekî yê di nav pergalê de ye. Hevpeymana bi pêşengiya DYê, bi alîkariya fonên taybet ên Kongreya DYê, avahiyên binçavkirinê yên heyî nû kirin, yên nû lê zêde kirin û gelek caran jî serdana wan avahiyan kir. Wezareta Parastinê ya DYê li avahî û kampan mûçe ji hêzên ewlekariyê re dabîn kir, û bi vê yekê derfet çê kir ku bi sedan, heta bi hezaran parastvanên nû werin gihandin. Wezareta Derve ya DYê alîkariya aborî dide rêxistina ku rêvebirina du kampên desteserkirinê dike, ku di nav de binesaziya kampan û her wiha pêşkêşkirina xizmetan û xizmetên ji karmendên rêxistinên sivîl re jî hene. Derbarê veguhestina girtiyên di nav vê pergalê de ya ji bo dewletên sêyem, HSDê ji Efûya Navneteweyî re ragihand ku hevpeymaniya bi serokatiya DYê beşdarî hemî rêkeftinên ku bi dewletên sêyemîn re hatine çêkirin û veguhastina asmanî jî di nav de hemî cure piştgiriya lojîstîk ji bo vegeran pêşkêş dike. Hikûmeta DYê di teşwîqkirina vegeran de jî roleke bi giştî girtiye.

Di gel ku hikûmeta DYê û endamên din ên hevpeymaniyê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê roleke sereke di pergala desteserkirinê de lîstibin jî, wan bi giştî li gel civaka navdewletî bi têra xwe piştgirî nedan rayedarên xweser ji bo çareserkirina maf û pêdiviyên bi deh hezaran kesên ku bi têkiliya bi DAIŞê re tên girtin. Rayedarên xweser xwedî çavkaniyên kêm in û rastî gelek nakokiyên domdar tên ku vê yekê jî rêvebirina pergala desteserkirinê ji wan re dijwartir kiriye. Her çi qas eşkere ye ku rayedarên xweser bi têra xwe piştgirî nestandine, dîsa jî ew berpirsiyar in ji bo binpêkirinên giran ên mafên mirovan û hiqûqa mirovî ya navneteweyî.

ÎŞKENCE Û MIRIN LI KAMPA SINI Û PANORAMAYÊ

AVAHIYA DESTESERKIRINÊ YA SINIYÊ

HSD li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi hezaran mêr û xortên ku tê texmînkirin girêdayî DAIŞê ne di du navendên sereke yên binçavkirinê de digire. Ya yekem kampa Siniyê ye ku dikeve derdora bajarê Şedadî yê girêdayî kantona Hesekê. Girtiyên berê ragihandin ku berî 2022yan Kampa Siniyê bi kapasîteya xwe ya tam û tijî derdora 3,000 heta 4,000 girtî digirt nav xwe û di nav wan de hejmareke hindik zarok jî hebûn. Ji sala 2023an ve li gor ragihandina HSDê nêzikî 800 girtî mane.

Rêxistina Efûya Navneteweyî li gel heşt mêrên ku di navbera 2019 û 2023an de li Kampa Siniyê hatibûn binçavkirin hevpeyvînek çê kir. Şahidiya wan hovîtiyeke bênavber û sîstematîk eşkere dike: destdirêjiya laşî ya rojane, biçûkxistin, bêparkirina ji xwarin, av, lênihêrîna bijîşkî û pêdiviyên din ên

bingehîn. Şahidên herî dawî nîşan didin ku heta nîvê sala 2023an hîn jî li Kampa Siniyê sûcên şer û binpêkirinên din tên kirin.

Li gor agahiyên van girtiyên berê, HSDê tundiya fizîkî ya rojane li ser girtiyan meşandiye. Girtiyên berê gotin ku ew rastî îşkence yan jî tevgerên xirab hatine yên wekî lêdana bi amûrên cur bi cur, qamçîkirina bi kabloyên elektrîkê, girtina ji destan a di rewşa ku wekî pozîsyona stresê ya shabeh tê zanîn, tundiya cinsî û şokên elektrîkê. Yusuf wiha got:

> **Ne rojek diyar, ne saetek diyar, ne jî rêbazeke diyar a îşkenceyê hebû... Tiştê herî xirab dema ku dihatin hundirê odeyê pêk dihat. Em tev li quncikê bûn, li ber dîwar bûn. [Wan] lûleyên plastîk, kablo, lûleyên pola hildigirtin, û li her derê me dixistin – li ser milên me, serî, pişta me, perçeyek ji laşê we nedima ku lê nehatibe xistin…**
>
> **Her 15 rojan carekê wan em derdixistin derve, li hewşê, rût û tazî… [Parastvan] darê gêziyê digirt, sabûn lê dixist û ew dixist laşê me. Bi wê darê tecawiz li mirovan dikirin... Carekê ez bi xortekî din re [ji hucreyê] derxistim... Ji jeneratorê kabloya elektrîkê anîn, bi elektrîkê îşkence li me kirin... Ez wisa difikirim ku zilamê li kêleka min mir. Tevger û qîrîna wî rawestiya... Ez gihîştim radeyekê ku êdî min nedikarî ku ez biqîrim.**

Hemî girtiyên berê yên ku bi Rêxistina Efûya Navneteweyî re axivîn, gotin ku HSDê li Kampa Siniyê ew ji xwarin û avê bêpar hiştin û ev jî bû sedema birçîbûn û tîbûna domdar. Girtiyan anîn ziman ku ji birçîna bêhiş bûne, ew qas birçî bûne ku enerjiya wan a çûna tuwaletê nemaye û hema hema nîvê giraniya laşê kêm bûye. Girtiyekî got ku ew û hevalên wî yên hucreyê bi rêk û pêk du-sê rojan bê av diman û bi bîr xist ku yek ji hevalên wî yê hucreyê ew qas tî bûye ku hewl daye mîza tuwaletê ya li hucreya xwe vexwe.

Girtiyên berê tev gotin ku ew di hucreyên xwe de bi şert û mercên dijwar û nemirovî re rû bi rû mane, wekî mînak hejmara girtiyan a pir zêde, nebûna hewayê û germahiya zêde. Hin girtiyan gotin ku wan nedikarî serên xwe biçon. Girtiyan her wiha li behsa hin "qanûnên" taybet kirin ku li Kampa Siniyê hatine ferz kirin, di nav pêkanînan de qedexekirina axaftinê ya bi hevalên xwe yên hucreyê re an jî nihêrîna li rêça parastvanan hene, û binpêkirina wan qanûnên taybet tê wê wateyê ku girtî dê rastî îşkenceyê an jî tevgera xirab were.

Li gor agahiyên girtiyên berê yên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî bi wan re hevpeyvîn çê kir, şert û mercên nemirovane û bêparkirina ji xwarin û avê bû sedema derketina nexweşî û kêşeyên din ên tenduristiyê, wekî mînak nexweşiyên çerm ên wekî xuriyê; nexweşiyên danûstandina bêhnê; pirsgirêkên gurçikê; tuberkuloz; û nexweşiyeke kujer a ku wekî «şîn» tê binavkirin û li gor pisporekî bijîjkî yê ku Rêxistin Efûya Navneteweyî pê re şêwirî dibe ku encama kêmbûna giran a vîtamîna B12 a ji ber xwarina nebaş çê bûye. Ev nexweşî di laşê mirov de bandorên xirab ên berfireh çê dike, yên wekî girtina xwînê ya nav sinîrên periferîkî, li mêjî, dil û mîde. Girtiyên berê diyar kirin ku gihandina lênihêrîna bijîşkî ne têra xwe an jî tam e û diyar kirin ku li kampa Siniyê tu klînîk an tîmeke tenduristiyê tune ye. Girtiyek berê got ku rewşek wisa hebû ku mirov digot qey her cure lênihêrîna bijîşkî "qedexe" ye; du kesên din jî gotin ku dermankirina bijîjkî bi dermanên janbir ve sînorkirî bû û ew jî kêm caran peyda dibûn.

Girtiyên berê gotin ku destdirêjiya laşî, şert û mercên nemirovî û nebûna lênihêrîna bijîşkî hemî bi hev re bûn sedema mirina herî kêm bi sedan kesan, heta ji wê jî zêdetir. Girtiyên berê gotin ku ew bûnê şahidê mirina hevalên xwe û kesên din û hejmara mirinan hin caran pir zêde bûye. Girtiyekî got ku dema ku rayedarên girtîgehê fana hewadariyê qut kirin, di 2020an de yek rojê 17 kesên di hucreya wî de fetisîn û mirin. Li gor agahiyên sê girtiyên berê laşên mirovên mirî li avahiya Kampa Siniyê di ciheke komî de vedişartin ku jê re "çal" digotin.

Girtiyek berê yê bi navê Abbas got ku di Berfanbara 2021an de, mirovên ku ji ber unîformayên wan ên leşkerî ew wan wekî leşkerên Amerîkî bi bîr tîne hatin da ku daneyên biyometrîk ên girtiyan bistînin û rewşa girtîgehê kontrol bikin. Wî got:

> **Em Amerîkiyan nas dikin, ew bi çek û kûçikên xwe tên… [Girtîgeh kontrol kirin, li me û hemû odeyên me geriyan… [Em] derdiketin hewşê. Ew heman hewş bû ku îşkence li dikirin. Dikaribûn xwîna li ser dîwêr bibînin. Dikaribûn kesên ji îşkenceyê birîndar bûbûn bibînin.**

AVAHIYA DESTESERKIRINÊ YA PANORAMAYÊ

Avahiya sereke ya duyem a ku mêr û kurik tê de dimînin bi navê Panorama ye ku ji aliyê HSDê ve tê rêvebirin û li bajarê Hesekê ye. Avahiya ku gelek caran wekî "El-Sina'a" jî tê binavkirin, wekî wargeh di Rêbendana 2022yan bû armanca erîşeke mezin a DAIŞê. Avahiyên li vê wargehê ji hêla hevpeymaniya bi pêşengiya DYê bi armnacên berfireh hatibû avakirin ku demeke kurt berî êrîşî temam bûbû. Li gor HSDê, li Panoramayê di Tebaxa 2023an de nêzikî 4,000 kes girtî hebûn, di nav de bi qasî 600 kurik û mêrên ciwan jî hebûn. Girtiyên ku li Panoramayê hatibûn ragirtin, diyar kirin ku her wekî Kampa Siniyê bi têrê xwarin ji wan re nehatiye dayîn. Li gor agahiyên ku zilamek dide, "Piştî êrîşê [êrîşa DAIŞê ya li ser avahiyê ya di sala 2022an de], bi maweyeke du meh û nîvan bi tenê rojê pariyek nan didan wan. Paşê rojê du [parî] nan dan me… Ez ji 65 kîloyan daketim 45an. Rewşa her kesî bi vî rengî bû."

Girtiyên li Panoramayê, her wekî li Kampa Siniyê, ji lênihêrîna bijîşkî ya bi têr bêpar in û ev yek bûye sedema belavbûna nexweşiyan ku di nav de nexweşiya weremê ya herî berbelav e û bi salan e berdewam e. Di Tebaxa 2023an de, li gor texmînên HSDê rêjeyek pir zêde ya mêr û xortan niha bi weremê vegirtî ne û got ku her hefte yek an du mêr an xortên ku li Panoramayê tên girtin ji ber vê nexweşiyê dimirin. Rayedarên xweser wekî bersiv ji Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî re di Adara 2024an de, gotin ku "nêzikî 600 girtiyên mêr" ji ber nexweşiya weremê û nexweşiyên din mirine ji dema ku navendê desteserkirinê hatiye avakirin heya îro.

Werem nexweşiyeke wisa ye ku zû belav dibe û eger neyê dermankirin di 50% bûyeran de dibe sedema mirinê. Xwarina nebaş a di heyama nexweşiyê de dikare xetera mirinê pir zêde bike. Nûnerekî HSDê piştrast kir ku ew dozên çalak derman nakin û girtiyên nexweş ji yên din cuda nakin. "Gelek kes mirin, û bi hezaran nexweş in," wî got û wiha: "Hejmar [hejmara mirinan] zêde dibe." Girtiyekî serpêhatiya xwe wiha bi par ve kir: "Li ser pişta min birîneke mezin hebû, tijî îltîhab tê de hebû … Ji 25 [zilamên]

di hucreya min de 12 kes bi nexweşiya weremê girtibûn … Hin mirovên nexweş qet nedikarîn biaxivin… Di odeya min de şeş kes mirin. ”

Di bersiva xwe de rayedarên xweser ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re diyar kirin ku kesên ku bi nexweşiya weremê ketine, lênihêrîna bijîşkî “li gorî çavkanî û şiyanên berdest” werdigirin, lê destnîşan kirin ku “kêmbûna” wan di malzemeyên bijîjkî de, tevî dermanan, ji bo dermankirina zirav heye. Hikûmeta DYê jî ji hêla xwe ve ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re got ku ew “bi hevkaran re dixebitin da ku hewcedariyên bijîjkî yên wekî weremê çareser bikin”. Rêxistina Efûya Navneteweyî hat agahdarkirin ku ji Cotmeha 2023an û pê ve li Panoramayê bernameya xwarinê dest pê kiriye. Di gel vê yekê jî, li gorî agahiyên di destê Rêxistina Efûya Navneteweyî de, zilamên mezin ên ku bi nexweşiya weremê ketine tedawiyeke pêr kêm wergirtine li Panoramayê, dibe ku di paşerojê de wergirtibin, lê di qonaxa amadekirina vê raporê de tedawiya weremê nedistandin.

ÎŞKENCEYA BIPERGAL A LI AVAHIYÊN DIN ÊN DESTESERKIRINÊ YÊN GIRÊDAYÎ HÊZÊN EWLEHIYÊ

Piraniya mêr, jin û zarokên ku di avahiyên girtinê yên hêzên ewlehiyê de ne, ji bilî Kampa Siniyê û Panoramayê, Sûriyeyî ne. Hin ji wan berî têkçûna DAIŞê ya herêmî hatin girtin, wek mînak dema ku ji herêmên di bin kontrola DAIŞê de derketin hatibûn desteserkirin. Yên din di operasyonên leşkerî yên domdar de hatin girtin, ku hin ji wan operasyonan bi avayekî hevbeş li gel hevpeymaniya bi pêşengiya DYê pêk hatin. Van girtiyan diyar kirin ku rastî îşkenceya sîstematîk an jî tevgerên xirab hatin. Di çarçoveya lêkolîna xwe de, Rêxistina Efûya Navneteweyî bi 46 kesan re hevpeyvîn pêk çê kir û wan mirovan diyar kirin ku di van avahî û bingehan de bi îşkence û tevgerên xirab re rû bi rû mane. Ew mirovên ku rastî îşkence û tevgerên xirab hatine 18 mêr, 15 jin û 13 zarok in.

Zêdetirî ji sêyan du parê mirovên vê komê gotin ku ew hatine îşkencekirin ji bo standina îtirafên bi zorê yên ji bo darizandinên li Dadgehên Parastina Gel, ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê tawanên têkildarî “terorîzmê” û tawanên din ên girêdayî ewlekariya niştimanî darizandinê dimeşînin. Di gelek rewşan de, peywirdarên lêpirsînê qurbanî mecbûr kirine ku di vîdyoyên “îtirafkirinê” de biaxivin ku ji hêla hêzên ewlehiyê ve hatine çêkirin, û ew neçar kirine ku şahidiya xwe ji ber bikin an jî bi dengekî bilind gotinên ku lêpirsîner ji wan re gotine dubare bikin.

Girtiyan diyar kirin ku lûle, şivikên dar û kabloyên elektrîkê jî di nav de bi gelek amûran li wan dane; ew ji bo demên dirêj di rewşên acizker de girtine; qesta xeniqandinê li wan kirine; û bi şokên elektrîkê îşkence li wan kirine. Mêr, jin û zarok tev bi rêbazên heman îşkenceyê û bi astên şîdetê re rû bi rû mane. Jinekê ku di sala 2022an de hatibû girtin wiha got: “Ez pê hesiyam ku du ji wan li ser çokên min radiwestin… Zilamek bi gewdeyeke mezin hebû, û ew pir bi lez ber bi min ve beziya û xwe avêt ser min. Wî milê min şikand.” Xortekî ku di sala 2022an de di hucreya yek kesî de hate ragirtin ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re wiha got: “Mezinahiya hucreyê 2 m dirêj û 1 m fireh bû. Tiştek di hundir de tunebû. Ronahî tunebû. Ez

li erdê razam… [Ez] dicemidîm. Timî di nav tariyê de bûm. Ez 18 rojan li wir mam… Ez gelek tirsiyam. Kes bi min re neaxivî."

Rêxistina Efûya Navneteweyî di heman demê de hin bûyer belge kirin ku di wan de lêpirsîneran gef li endamên malbata girtiyan kirine da ku bi darê zorê îtirafan ji girtiyan bistînê, ku di nav wan bûyeran de wekî mînak gef li sê jinan kirin ku yan nahêlin ew zarokên xwe bibînin yan jî zarokên wan dê ji wan bistînin, û di hin mînakan de jî li ber çavên zarokên wan îşkence li dê û bavên wan kirin. Jinekê ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re wiha got: "Mêrê min anîn û çek dan serê wî. Ji min re gotin, ‹Eger tu itiraf nekî, [em ê] guleyê berdin wî.'" Wê got ku ew mecbûr ma «îtiraf bike" da ku îşkenceyê rawestînê. Lewre ew bi zaroka wê ya biçûk di hucreya yekkesî ya pir sar de digirtin û bi lêdanê, bi şokên elektrîkê û bi girtina di rewşên acizker de îşkence lê dikirin.

Heşt jinan diyar kirin ku bi piranî ji aliyê endamên hêzên ewlekariyê yên mêr ve rastî şîdeta li ser bingeha zayendî hatine. Ji wan jinan sê kesan gotin ku di dema ducaniyê de rastî lêdanê an jî şoka elektrîkê hatine. Yekî jî wiha got: "Di dema lêpirsîna min de şokên elektrîkê dan min. Wê demê ez ducanî bûm. [Lêpirsîner] ev yek dizanî, wî ji min re got: 'Ez ê bi zorê zaroka te ji ber te bibim û wî wisa jî kir." Sê mêran gotin ku di dema lêpirsînê de rastî tundiya zayendî hatine. Zilamekî got ku lêpirsînerê wî jê pirsiye bê ka zarokên wî hene yan na û dema ku wî got zarokek wî heye, lêpirsîner gotiyê, "yek bes e" û bi tundî li penîsê wî xistiye.

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi sîxurekî re hevpeyvîn çê kir ê ku li avahiyeke girtinê ya girêdayî hêzên ewlekarî ya bi navê «El-Kesrah» a li parêzgeha Dêrezorê kar dikir. Wî jî rêbazên îşkence û tevgerên xirab ên li wê navendê pênase kirin ku dişibin pênaseyên girtiyên berê, û wiha axivî:

> **Heya ku wan îtîraf bidana, me li wan xist… Eger hin kesan li ber xwe bidana, me hingê rojê du caran ev tişt dikirin… [Xebatkarên girtîgehê] destûrê didin girtiyan ku tenê yek tuwaletê bi kar bînin. Wan heft girtî dixistin yek tuwaletê da ku hemî bi hev re tuwaletê bi kar bînin. Dema ku yekî şixulê xwe pêk dianî şeş radibûn û çavên xwe digirtin û dûv re jî yekî li derveyî tuwaletê dest bi rîtinê dikir. Ji bo her kesî pênc an heft saniye dijjmartin, eger hûn pê re negihîjin dê li we bixistana. Ji ber vê yekê wan di hemamê de hema li her derê dirîtin û dimîstin… Me bi her awayî, her dem heqaret li wan dikir.**

Derbarê tesbîtên Rêxistina Efûya Navnetewî ya derbarê îşkencekirin û tevgerên xirab de, rayedarên xweser got ku ew ê li gorî delîlên van binpêkirinan tevbigerin, lê diyar kirin: "Me tu agahî û gilî di vî warî de negirtiye û eger ev yek pêk hat, bizanin ku ew kiryarên takekesî ne."

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi şeş kesan re hevpeyvîn çê kir ku gotin ew pêşî ji aliyê endamên hevpeymaniya bi pêşengiya DYê ve hatin lêpirsînkirin û piştre jî ew veguhestin HSDê û hêzên ewlekarî yên girêdayî wê. Du ji van mirovan piştî veguhestinê rastî îşkence û tevgera xirab a ji aliyê HSDê û hêzên ewlehiyê yên girêdayî wê ve hatin. Berpirsekî berê yê xwecihî yê RXDBRSê, ku di êrîşeke hevbeş ji aliyê hêzên ewlekarî û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê ve hatibû girtin, got ku ew biroj li baregeha Conoco ya hevpeymaniyê hatiye lêpirsîn. Li gor zanîna wî lêpirsînerên wî welatiyên DYê bûn, lewre devoka wan a

axaftinê û alayên DYê yên li ser cilûbergên wan ew wisa nîşan didan. Wî got dema ku ji van lêpirsîneran re eşkere bû ku tu pêwendiya wî bi DAIŞê re tune, ew hat veguhestin ji bo El-Kesrahê, û li wir ew 10 rojan di hucreya yek kesî de hat ragirtin. Wî got ku li heyama lêpirsînên ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn ve «tenê çend şeqam" lê dan, lê belê şeş kesên ji wan heşt mirovên bi wî re girtî di hucreya wî de hatin îşkencekirin, û wî ji me re behsa qêrîn û birîndarbûna wan kir. Mirovekî din got ku ew di operasyoneke hevbeş a HSD û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê de hat girtin, li heman baregeha Conoco hat lêpirsîn, û piştre ew veguhestin ji bo El-Kesrahê. Li wir, wî got ku lêpirsînerên hêzên ewlekarî yên rayedarya xweser di dirêjahiya 45 rojan de her roj bi alavên cuda yên wekî dar û kabloyên reş lê wî xistin.

KUR Û MÊRÊN CIWAN ÊN KU LI AVAHIYÊN DESTESERKIRINÊ TÊN GIRTIN

Nêzikî 1,000 kur û mêrên ciwan ên hemwelatiyên Sûryeyî û biyanî yên ku di destpêkê de wekî kurik hatibûn binçavkirin, li navendên avahiyên desteserkirinê dimînin. Ew rastî gelek binpêkirinên mafên mirovan hatine, û her wekî li jor jî hat qalkirin bi îşkence an jî tevgerên xirab re rû bi rû mane. Ji wan mirovan bi tenê piçek zêdeyî 10% bi pêkanîna sûcan hatine tawanbar kirin û derdora 800 kes di girtîgehên mezinan de têne ragirtin. Zarok ji her du kampên desteserkirinê veguhestine avahiyên desteserkirinê ku di nav de navendên "rehabîlîtasyonê" jî hene, û ew piştî derketina ji herêmên di bin kontrola DAIŞê de yan jî di dema operasyonên serbazî yên berdewam de hatin girtin.

Kur û mêrên ciwan ên Sûriyeyî yên ku di destpêkê de wekî kur hatibûn binçavkirin bi qasî nîvê vê nifûsa zindanê ne. Zêdetirî 300 kur û mêrên ciwan ên Sûriyeyî yên ku li Panoramayê girtî ne tu carî nehatine tawanbarkirin an jî dadgehkirin, her çi qas rayedaran dikaribû pêşekî bida doza wan û eger pêwîst bikira jî dikarî darizandina wan bike. Di vê qonaxê de, eger rayedarên xweser darizandina wan kesan kiriba, cezayê wan herî giran ê li gor qanûnên herêmê 7 sal bûya û gelekan jî niha ew ceza temam kiribûn.

HSD û hêzên ewlekariyê yên girêdayî wê, carinan bi hevkariya hevpeymaniya bi pêşengiya DYê re, operasyonên xwe yên leşkerî didomînin û di encama wan operasyonan de carinan ciwanên Sûriyeyê digirin û daxilî nav pergala xwe ya desteserkirinê dikin. Di encama van girtinan de gelek caran kurik jî tên lêpirsînkirin û ew bi mezinan re tên girtin û rastî îşkence û tevgerên xirab tên. Di dema dadgehê de wan xortan qet yekî jî alîkarî ji parêzeran wernegirt û dêûbavên wan an jî xudanekî wan li dadgehê amade nebû.

Nîvê din ê nifûsa zarokên desteserkirî ji hemwelatiyên biyanî pêk tê û di salên pêş de wisa diyar e ku mezinahiya vê nifûsê dê pir zêde bibe. Rayedarên xweser bi darê zorê kurikên biyanî ji dêûbav û xudanên wan ên li kampên desteserkirinê vediqetînin, ku di 11 an 12 salî dest pê dikin, û wan vediguhezînin avahiyên girtinê. Rayedarên xweser ji bo van veqetandinan hin pîvan diyar kirin ku tev jî bi xetereyan re têkildar in ku ev zarok rû bi rû ne an jî wisa tê îdiakirin. YPJê (Yekîneyên Parastina Jinê ya girêdayî HSDê) ji Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî re ragihand ku hevpeymaniya bi pêşengiya DYê ji pîlanên derxistina zarokên taybet ji kampan hatiye agahdarkirin. Di bersiva xwe ya nivîskî de hikûmeya DYê ji Rêxistina Efûya

Navneteweyî re diyar kir ku ew bi rayedarên xweser re tevdigerin da ku biryar bidin ku zarok di navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan de tenê pişt î nirxandina berjewendîyên zarokan werin ragirtin.

Her çi qas dibe ku sedemên mafdar hebin ku rayedarên xweser ji bo bersivdana gefên ku zarok li kampan rû bi rû ne tevbigerin, pêşnûmeya polîtîkaya veqetandinê ya ku ji Adara 2024an vir ve di meriyetê de ye, di zagona mafên mirovan a navneteweyî de tune ye ya ku ji bo dêûbav û zarokan tedbîrên girîng misoger dike. Bi ser de jî, berevajî rênîşandana di kargeriyê de, rayedarên xweser di bersiva xwe ya nivîskî ya ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re diyar kirin ku cudakirina wan bi rastî li gorî temen û pîvanên ku ji hêla rêveberiya kampê ve hatine destnîşankirin pêk tên. Daxuyaniyên peywirdarên payebilind destnîşan dikin ku ew di rastiyê de kurikan ji kampan derdixin da ku li hember zêdebûna nifûsa kampê ya ciwan û xortên biyanî çareseriyekê peyda bikin, ku bi baweriya wan dibe ku bibe metirsiyeke pêşerojê.

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi malbata xortekî bi navê Xelîl re hevpeyvînek çê kir, yê ku hatibû girtin û ji kampekê hatibû derxistin û ew biribûn navenda "rehabîlîtasyonê" ya ciwanan. Dayika wî ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re wiha got: "Wan got ku ew mezin bûye û divê biçe. Serê min maç kir... Dema dayikek ji kurê xwe veqete. Ez bê zar û ziman mame… Ew ne tenê parçeyek dilê min e, ew hema dilê min e." Xwişka Xelîl got ku pişt î çûyîna wî diya wan bi qasî 25 kg winda kir û porê wê gewr bû. Di nav du salan de bi tenê du caran serdana wî kirine û du caran di telefonê de bi Xelîl re axivîne. Birayekî biçûk ê Xelîl heye ku temenê wî ber bi xortaniyê ve diçe. Xwişka Xelîl ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re got, "Ji ber vê siyasetê ez serê birayê xwe timî ditepisînim da ku bilind nebe… Ew 10 salî ye. Lê şukir ji Xwedê re bejna wî kurt e. Eger bejna wî bilindtir bûya dê wî bibin."

Rayedarên xweser ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku ew pîlan dikin ku kurikên ciwan ji kampan veguhezînin û wan li 15 navendên desteserkirinê, ku ji hêla rayedarên xweser ve wekî navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan tên binav kirin, bi cih bikin, û diyar e ku ew biryar li dijî pîvanên sînordarkirina veqetandinên wiha ye û li gor hiqûqa navneteweyî wekî çareseriya dawî tên dîtin.

Kurik û mêrên ciwan ên hemwelatiyên biyanî yên ku di zarokatiyê de hatine desteserkirin, bi awayekî fermî nayên darizandin, û tu derfeta berdanê ji wan re tune heya ku ew ji hêla welatên xwe ve bi şûn de neyên wergirtin. Rêxistina Efûya Navneteweyî diyar kir ku hin hikûmet qebûl nakin ku kurên 18 salî an jî yên ku mezin bûne û her wiha ciwanên ku gumana wan bi endamtiya berê ya DAIŞê heye wergirin ji bo welatê xwe. Heya roja îro, her çi qas daxwaza xwe ya wergirtina jin û keçikan a ji kampan diyar kiribin jî, bi tenê çend hikûmetan kurik û mirovên ciwan ên ji navendên desteserkirinê û ji navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan qebûl kirine.

JIN Û KEÇÊN LI AVAHIYÊN DESTESERKIRINÊ

Di Sibata 2023an de, YPJê ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re got ku ew bi gelemperî li dor 30-50 jinên biyanî li Girtîgeha Jinan a Hesekê digirin. Rêveberan her wisa piştrast kirin ku ew carinan keçên bêxudan

jî di avahiyê de digirin. Jin û keçên hemwelatiyên biyanî hemî jî di nav şert û mercên cudakirî de bi mehan tên girtin, darizandina wan pêk nayê û di bin xetereya windakirina bi zorê de dijîn. Rayedarên darizandinê jî gotin ku herî kêm 100 jinên Sûriyeyî û hejmareke hindik a keçan bi tawanên girêdayî DAIŞê hatine dadgehkirin ku li deverên rêveberiya xweser xwedî desthilatî ye pêk hatine. Gelek jinên ku ji ber wan tawanan ceza girtine di hevpeyvînên li gel Rêxistina Efûya Navneteweyî de gotin ku ji bo "îtiraf bikin" îşkence li wan hatiye kirin. Kesên ku bi wan re hevpeyvîn hatin çêkirin ragihandin ku jinên biyanî û jinên Sûriyeyî li avahiyên din ên wekî kampên Al-Hol û Rojê de jî dimînin ku ji aliyê hêzên ewlehiyê ve tên rêvebirin.

Hin jinên biyanî yên ku ji bo navendên desteserkirinê hatine veguheztin ji bo mirovên din ên li kampê û her wiha ji bo ewlehiya herêmê wekî xetere hatine dîtin. Lê belê, Rêxistina Efûya Navneteweyî diyar kir ku jinên biyanî û zarokên wan ên ku ji kampa Al-Holê vediguhezin ji bo herêmên nû yên kampa Rojê, di çarçoveya pêvajoya veguheztinê ya asayî de li destpêkê li Girtîgeha Jinan a Hesekê, di hin rewşan de bi mehan, tên ragirtin. Hejmarek ji van jinan ji Rêxistina Efûya Navnetewî re gotin ku ew neçar kirine da ku belgeyên ku nikarîbûn bixwînin îmze bikin û ji wan re hatiye gotin ku eger red bikin, ew ê heta hetayê di girtîgehê de bimînin. Her wiha jin û keçên biyanî ji bo demên dirêj li Girtîgeha Jinan a Hesekê an jî li avahiyên desteserkirinê yên li kampan tên ragirtin dema ku li ba wan telefonên destan peyda dibin.

Ji hêlekê ve rayedaran destûr dan ku hin jin zarokên xwe avahiyên desteserkirinê li cem xwe xudan bikin, lê hin jin jî ji wê mafê bêpar man. Yanzdeh jinên ku bi Rêxistina Efûya Navneteweyî re hevpeyvîn çê kirin, diyar kirin ku ew neçar mane zarokên xwe li dû xwe bihêlin, û dema amadebûnê jî nedane wan. Dema ku jinebiya bi navê Rabia li Reqayê hat girtin, sê zarokên wê bi tena serê xwe hatin hiştin. Wê got, "Serdana dawî meha borî çê bû. Beriya wê jî şeş meh derbas bûbûn... Dema tên vir, ez destên wan digirim, hema tev hestî û xwîn in. De ka ez ê çi bikim?" Rabiayê ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re got ku di serdana dawî de, tenê du zarokên wê yên biçûk hatin û wan jê re got ku kurê wê yê 12 salî winda bûye.

DARIZANDINÊN BIKÊMASÎ

Takekesên ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi têkildariya DAIŞê tên sûcdarkirin li Dadgeha Parastina Gel tên darizandin. Ji Adara 2024an û vir ve, piraniya wan kesên ku tên darizandin Sûriyeyî ne; di salên 2018-2019an de jî bi dehan Iraqî ji bo demeke kurt hatin darizandin. Rayedarên xweser di sala 2023an de pîlasaziya xwe diyar kirin ku ew ê dest bi darizandina hemwelatiyên biyanî din bikin, dîsa jî li heyama weşandina vê raporê de ew darizandin hîn jî pêk nehatibûn. Di bersiva xwe ya nivîskî de ya ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re, rayedarên xweser gotin ku dadgehan zêdetirî 9,600 Sûriyên ku tê îdîakirin girêdayî DAIŞê ne, dadgeh kirine. Li gor texmîna rêveberekî dadweriyê her sal li dor 1,500-2,000 dozên Sûriyeyî li dadgehan tên meşandin. Li gor agahiyên ku ji aliyê rayedarên xweser ve hatine dayîn, wan hîn derbarê 2,000 Sûriyeyî, 350 Iraqî, û 2,000 mêr û xortên biyanî yên din ên di girtîgehên hêzên ewlekariyê de ne darizandin pêk neanîne. Piraniya van kesan zêdetirî 5 sal in girtî ne.

Darizandinên li Dadgehên Parastina Gel bi giranî bi binpêkirinên mafên mirovan tên meşandin, lewre darizandin qîma xwe bi "îtirafan" tînin ku bi îşkenceyê an jî bi tevgerên xirab ên din hatine wergirtin, û hemî qonaxên lêpirsîn û darizandinan bê parêzer pêk tên. Di bersiva xwe de, rayedarên xweser diyar kirin ku zêdetirî 95% ji kesên ku bi têkiliya bi DAIŞê re tên sûcdar kirin di encamê de wekî sûcdar hatine diyarkirin. Darizandin di heman demê de ji hêla pêvajoya îtirazê jî xwedî kêmasî ye û bersuc ji derfeta kêmkirina cezayan û maweya girtinê bêpar dimînin. Piraniya kesên dadgehkirî di hevpeyvînê de gotin ku ew tenê dikarin bi temamkirina formekê ya ku piştî cezakirinê ji wan re tê pêşkêş kirin îtirazê bikin, û piraniya wan îtirazan jî bêyî ku guhdarî bikin tên redkirin. Sê kesan ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re got ku di encama îtiraza xwe de cezayê hîn dirêjtir standine.

Ji ber ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê derfetên parastinên dadwer tune ye, bi tenê tawanbarkirina kesekî ya bi DAIŞê re dikare wan mehkûmî bi salan girtina keyfî bike. li bakur-rojhilatê Sûriyê diyar kir ku sûcdarkirin bi kêmanî ji bo du armancan tên kirin. Ya yekem, rayedarên xweser tawanbariya endamtiya DAIŞê bi kar tînin da ku wan mirovan bitirsînin û bêdeng bikin. Ya duyem, hem raya giştî û hem jî rayedarên xweser tawanbariyên wiha ji bo tolhildana dijminatiyên şexsî an jî di nakokiyên eşîrî de bi kar tînin. Rêxistina Efûya Navneteweyî 18 bûyer belge kirin ku tê de girtiyan gotin ku ew ji ber wan sedemên jor bi derewan bi angaşta endambûna DAIŞê re hatine tawanbarkirin. Di hin bûyeran de, hevpeymaniya bi pêşengiya DYê çavkaniyên leşkerî û piştgirî terxan kir ji bo girtina hin kesan di gel ku palpiştên şênber hebên ku ew mirov bi derew û hincetên bêbingeh hatine tawanbar kirin.

Her çi qas rayedarên xweser misoger dikin ku di her desteya darizandinê de ji sê dadgeran yek jin be jî, Rêxistina Efûya Navneteweyî di dadgehan de gelek bûyerên neheqiya zayendî jî tespît kirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî diyar kir ku jin û keçên Sûriyeyî, her çi qas têkiliya wan bi xwe tune be jî, di metirsiya cezakirinê de ne eger ku mêrên wan di nav DAIŞê de çalak bin. Pênc jinan ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku ew bi tawanên "terorîzmê" yên girêdayî kiryarên mêrên wan ve hatine cezakirin, ku di nav wan tawanbariyan de angaştên wekî "nedayîna agahiyan" ên derbarê mêrên xwe, an jî ji bo hevkariya bi DAIŞê re komkirina çek û pereyan a ji bo çalakiyên mêrên xwe. Dema ku wan jinan qala kiryarên tund ên bi darê zorê û bi gef, qala destdirêjî û xapandinê kirine, dadgeran angaştên wan bi têrê li ber çavan negirtine. Her yek ji wan jinan ji ber wan tawanbariyên giştî ji çar heta 10 salan cezayê girtîgehê standin.

Bi heman awayî, rayedarên xweser li şûna ku pergala dadmendiya zarokan bi kar bînin, darizandina zarokan li Dadgehên Parastina Gel pêk tînin. Rêxistina Efûya Navneteweyî diyar kir ku zarok jî wekî mezinan rastî binpêkirinan tên. Ew qet nikarin bi piştgirîya dêûbavan an jî parêzerekî di pêvajoya darizandinê de xwe biparêzin.

KAMPÊN DESTESERKIRINÊ YÊN DERMIROVÎ Û TIJÎ TUNDÎ

Ji Tebaxa 2023an û vir ve, rêveberiyên xweser ên bakur-rojhilatê Sûriyeyê zêdetirî 46 hezar û 600 kes li du kampên desteserkirinê yên El-Hol û Rojê digirin. Piraniya mezinan jin in, û nêzikî 29,000 ji wan kesên ku di kampan de dijîn zarok in û piraniya wan jî di bin 12 salî de ne.

Di 2022an de, Serperiştê Giştî yê Operasyona Çareserkirina Navxweyî di raporeke sê mehane de ya ji Kongreya DYê re got, "Kampên Al-Hol û Roj li kantona Hesekê ne û wekî kampên sivîl alîkariya mirovî didin kesên bêwarbûyî." Lê rayedarên xweser îdia dikin ku bi hatina mirovên ji şerên dawî yên bi DAIŞê re taybetmendiya kampan guherî û ew mecbûr man kampan di sala 2019an de "kilît" bikin. Ev tê vê wateyê ku kesên di kampan de dijîn ne nikarin bêyî pejirandina hêzên ewlehiyê ji kampan derkevin. Di pratîkê de, jixwe yên ku li kampan têne girtin bi tenê di rewşên awarte de, wekî rewşên lezgîn ên tenduristî, derdikevin. Tu kesê ku li wan her du kampan dimîne hîn bi pêvajoyeke darizandinê re dadwerî û vekolînê re rûbirû nebûye û ne jî derfet jê re nehatiye dayînku li pêş dadgeheke serbixwe mafê xwe yê îtirazê bi kar bîne. Ji ber vê yekê jî hemî kesên ku li kampên Hol û Rojê tên girtin, bi awayekî keyfî û di maweyeke nediyar de - piraniya wan nêzikî 5 sal in- têne girtin.

Ew ên ku li kampa Al-Holê girtî ne ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku ji ber tundî û tawanên din ên ku ji aliyê alîgirên DAIŞê û aktorên din ên tawanbar li kampê tên kirin, ew neçar mane ku jiyanek ne aram û pir caran jî ne ewle bijîn. Gelek kesan gotin ku van şert û mercan rewşeke tirsnak a domdar derxistiye holê. Çend kesên li kampên Al-Hol û Rojê ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku mezinkirina zarokên a li hawirdora tijî tundî ya li kampan pir dijwar e. Melissa, jineke li kampa Rojê, wiha got: "Ji bo mezinkirina zarokekî alîkariya gelek mirovan lazim e, û ev der jî cihekî pir xeternak e."

Kesên ku li kampên Al-Hol û Rojê tên girtin, bi şert û mercên nemirovane û xeternak ên jiyanê re rû bi rû ne, her wekî kêmbûna xwarin, av û lênihêrîna tenduristiyê. Şert û mercên kampên Al-Hol û Rojê ji hêla paqijiyê ve jî nebaş in. Aktorên alîkariyên mirovî ragihandin ku li kampa Al-Holê pirsgirêkeke mezin a rêvebirina bermayiyan heye, lûleyên ava serşokê di ser re diavêjin, ava kanalîzasyona vekirî hin caran dide bin konan û hin çalên vekirî hene ku zarokên ketî tê de jiyana xwe ji dest dane. Kesên li kampa Rojê tên ragirtin bandoreke xirab ji qirêjiya zeviyên neftê yên li derdorê digirin ku yek ji wan 200 metre dûrî kampê ye. Layla, jineke 30 salî ku li kampa Roj girtî ye, ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re wiha got: "Em nikarin nefesê bistînin. Ew bîhn mirov difetisîne... Divê em pozê xwe bipêçin û qumaşên şil bidin li ber rûyê xwe. Em bi tenê hewl didin ku di hundirê konê de bimînin... Jiyana li vir hema mirineke hêdî û bi êş e."

Mirovên bi DAIŞê re têkildar li kampa Al-Holê jin û keç bi hinceta binpêkirinên "exlaqî" kirin armanc. Li hember van kiryaran û hin gefên kuştinê yên DAIŞê, rayedaran di nava kampê de bi navê "herêma ewle" ciheke terxan kirin. Xebatkarên alîkariyên mirovî ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku ev herêm li dor sala 2021an hat dabeş kirin, û dihat armanckirin ku Sûriyeyî û Iraqiyên di nav metirsiyê de yên ku bilez dihatin şopandin zûka vegerînin warên wan ên ku jê hatine. Li gor agahdariyên xebatkarên mirovî jî ew herêm di pratîkê de bû ciheke tijî metirsî ji bo tundiya zayendî û fuhûşa bi darê zorê ku hêzên ewlekariyê

yên kampê jî tê de hene. Xebatkarên alîkariyên mirovî ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku, ji nîvê an jî dawiya sala 2023an û vir ve, wan raporên destdirêjiyê ji "herêma ewle" wernegirtine. Lê belê, di rewşa heyî de gelek metirsî ne, bi taybetî jî ji bo keç û jinên li kampa Al-Holê. Xebatkarên alîkariyên mirovî di heman demê tundiya li ser bingeha zayendî ya li kampa Al-Holê jî ragihandin, û gotin ku di nav de îstîsmara zayendî ya girêdayî pêşkêşkirina xizmetan jî heye. Rayedarên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî bi wan re hevpeyvîn çê kir diyar kirin ku ew nikarin bi têra xwe jinên di kampê de biparêzin. Berpirsekî pilebilind ê hêzên ewlehiyê wekî mînak wiha got: "Ji ber ku em kampê bi awayekî tam kontrol nakin, zehmet e ku jin bikarin bibêjin ku ew bûne qurbaniyên tundiya zayendî. Ew rewşê bi têra xwe ewle nabînin ku derkevin pêş û biaxivin."

QURBANIYÊN BAZIRGANIYA MIROVÎ TÊN PAŞGUHKIRIN

Piraniya mirovên ku wekî kesên girêdayî DAIŞê tên desteserkirin û li kampan an jî avahiyên desteserkirinê tên girtin ji aliyê koma çekdar ve hatine firotin. Di gel ku ji bo vegerandina jin û zarokên Êzdî - her çi qas bi têrê nebe jî - hewldanên girîng hebin jî, ji bo parastina mafên kesên din ên ku ji hêla ISê ve hatine firotin xebateke berbiçav nehatiye meşandin. Lêkolîna Rêxistina Efûya Navneteweyî nîşan dide ku dibe ku bi hezaran qurbaniyên din ên bazirganiya mirovî li kamp û avahiyên desteserkirinê hebin. Piraniya van kesan jin, zarok û xort in.

Bîst û heşt kesên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî li kampan û li avahiyên desteserkirinê bi wan re hevpeyvîn çê kir, destnîşan kirin ku ew bûne qurbaniyên bazirganiyê ya bi destê DAIŞê ve. Ev rapor û hevpeyivînên din nîşan didin ku, ji bilî bazirganî û tawanên hovane yên ku DAIŞê li dijî Êzdî û civakên din ên etnîkî û olî pêk anîne, wan di heman demê de li herêmên bin desthilatiya xwe karê firotina jin û zarokên her du civakên sunnî yên herêmî û yên ji welatên sêyem jî bi awayekî sîstematîk pêk anîne. Di nav wan pêkanînan de firotina jin û keçan a ji bo zewaca bi darê zorê heye ku bi rêya sîstema DAIŞê ya mêvanxaneyên jinan pêk hatiye, û her wisa bazirganiya kurikan a ji bo perwerdekirin û şerkirinê jî meşandine.

Rayedarên xweser hem dema ku hejmareke mezin a mirovan ji herêmên di bin kontrola ISê de derketin û hem jî di salên pişt î wê de, her çi qas li gor qanûnên navneteweyî pêwîst be jî, nekarîne mafên qurbaniyên bazirganiyê biparêzin. Di vê mijarê de rayedaran ji welatên din, ji endamên hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û ji NYê piştgiriyek pir kêm hilgirtine. Di encamê de jî qurbaniyên bazirganiya mirovî mecbûr mane ku bi kesên ku bi têkildariya DAIŞê re tên tawanbarkirin li heman kamp û avahiyan bijîn. Rewşa hin jin, zarok û xortên ku li dadgehên Parastina Gel tên darizandin jî wekî kesên ku ji bazirganiya mirovî rizgar bûne kifşe dibe, lê dîsa jî mekanîzmayek tune ji bo naskirina qurbaniyên bazirganiyê û parastina wan a ji cezakirina kiryarên ku di encama rasterast ya bazirganiya mirovî de kirine.

Di bersiva xwe ya nivîskî de ya ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re, rayedarên xweser gotin ku wan li ser her kesê di pergala desteserkirinê de lêkolîn kirine da ku diyar bikin ka kî sûcdarên bazirganiyê ne û kî jî

qurbanî ne. Digel ku gelek ji kesên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî bi wan re hevdîtin pêk anî gotin ku ew rastî lêpirsînan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine, yek ji van lêpirsînan jî ji bo kifşekirina bazirganiya mirovî nehatine çêkirin an jî nebûne sedema gavên erênî ji bo misogerkirina mafên qurbaniyan. Hin kesên ku agahiyên derbarê wan nîşan didin ku wan bazirganiya mirovî kirine, di lêpirsînên xwe de qala îşkence an tevgerên xirab kirin.

Li cihê ku qurbaniyên bazirganiya mirovî li gor hiqûqa navneteweyî sûc pêk anîbin, divê ew ji ber kiryarên xwe bên darizandin eger ku wekî encama rasterast a bazirganiyê neçar nemabin da ku wan sûcan pêk bînin. Lê belê, qurbaniyên bazirganiya mirovî ji bo piştgirî, dadwerî û çareseriyên ku pêk nayên jî xwedî gelek mafên din ên zêdehî ne. Dewletên ku hemwelatiyên wan an jî niştecihên wan ên daîmî bûne qurbaniyên bazirganiya mirovî, li gor qanûnên navneteweyî yên li dijî bazirganiya mirovî û mafên mirovan xwedî erk in ku wan vegerînin welatên xwe.

VEGUHASTINÊN JI BO IRAQÊ Û EREBISTANA SAUDÎ

Desthilatdarên xweser û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê di veguhestina girtiyên mêr ên ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê ya ji bo Erebistana Saudî û Iraqê de cih digirin. Di her du rewşan de, rayedarên xweser û hikûmeta DY wisa diyar e ku prensîba hiqûqa navneteweyî ya nevegerandinê bin pê kiriye. Ev prensîb veguhestina kesan a ji bo wan dewletan qedexe dike ku eger hincetên maqûl hebin ku bawer bikin dê bi binpêkirinên mafên mirovan ên cidî yên wekî îşkence û qesta jiyanê re rû bi rû bimînin.

Derbarê Erebistana Saudî de, rayedarên xweser ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re gotin ku wan mêrên Saudî ji navendên desteserkirinê yên li bakurê rojhilatê Sûriyeyê veguhestine Erebistana Saudî, û di nav wan de komek ji 18 mêran heye ku derdora Gulana 2023an hatin veguhestin. Hikumeta DYê ragihand ku wan ji bo vegerandina wan 18 mêran derfet dabîn kirine. Lêkolîna berê ya Rêxistina Efûya Navneteweyî nîşan dide ku darizandinên têkildarî terorê yên li Erebistana Saudî qet dadwer nîn in, û piştî îtirafên ku bi îşkence an jî tevgerên xirab tên bidestxistin bi awayekî domdar cezayê kuştinê tê dayîn.

Derbarê Iraqê de, gelek jêderên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî bi wan re hevpeyvîn çê kirin, gotin ku HSD, rayedarên Iraqî û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê di Rêbendana 2022an de li ser vê esasê li hev kirin: her meh 50 mêrên Iraqî ji navendên desteserkirinê yên li bakurê rojhilatê Sûriyeyê dê bên veguhestin ji bo rayedarên Iraqî da ku bên dadgehkirin an jî serbestberdan. Di çarçoveya vê lihevkirinê de bi sedan girtiyên mêr ên Îraqî piştre ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatin veguhestin ji bo rayedarên Iraqî.

Li gorî nûnerên HSDê, hevpeymaniya bi pêşengiya DYê bi giranî beşdarî hevdîtinên peymanê bûye û di veguheztina fîzîkî ya mêr û xortan de jî roleke sereke lîstiye. General Mazlûm Ebdî, Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) ji Rêxistina Efûya Navdewletî re wiha got: “Lihevhatineke me bi rayedarên Iraqî re heye… Amerîkî aliyê sêyem in… HSD wan karê veguhestinê pêk tîne [û] hevpeymanî jî ji bo veguhestinê parastina hewayî dabîn dike. Yên ku hevdîtinên vê peymanê pêk anîne

hêzên hevpeymaniyê ne." Nûnerekî din ê HSDê got, "ew wan bi otobusên bajêr dibin ser sînor û piştre [rayedarên Iraqî] wan pêşwazî dikin. Hevpeymanî bi dron, balafir û maşînên zirxî otobusan dişopîne."

Di bersiva xwe de ya ji Rêxistina Efûya Navdewletî re, hikûmeta DYê got "Vegerandina Iraqiyan li gorî peymanên ku di navbera HSD û Hikûmeta Iraqê de hatine kirin, pêk tê. Lê belê, di bersiva xwe de, rayedarên xweser got "veguhestin bi hevkariya hevmeymaniya cîhanî tê kirin... ku, di encamê de, çavdêriya bicihanîna xalan û peymanê dike". Hikûmeta Iraqê jî di bersiva xwe ya nivîskî de diyar kir ku "kordînasyona" di navbera rêveberiya xweser û hikûmeta Iraqê de "ji aliyê koalîsyona bi pêşengiya DYê ve hatiye pesendkirin."

Raporên Wezareta Derve ya DYê yên li ser Iraqê, û her wiha gelek raporên mafên mirovan û medyayê, belge kirine ku çawa rayedarên Iraqî îşkence û tevgerên xirab ên din bi kar tînin ji bo bidestxistina «îtirafan" - bi taybetî li hember kesên ku gumana têkiliyê bi DAIŞê re hene - û dewleta Iraqê li ser bingeha wan îtirafên zorpêdayî cezayê îdamê dane. Li gor raporeke medyayê, rêjeya mehkûmkirina dozên girêdayî DAIŞê li Iraqê %98 e. Rapora Komîsyona Bilind a Mafên Mirovan a Iraqê, ku di rapora Wezareta Karên Derve ya DYê de jî cih girt, ragihand ku di sala 2019an de 900 kesên ku bi tevlêbûna DAIŞê hatibûn sûcdarkirin li dadgehên pispor ên "terorê" hatin darizandin. Ji wan mirovan 794 kesan cezayê îdamê wergirtin û wateya vê yekê jî ev e ku rayedarên Iraqî di %88ê bûyeran de cezayê îdamê didin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî doza heft mêrên Iraqî yên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê ji bo Iraqê hatine veguhestin belge kir. Ji wan şeş kes di dema lêpirsînan de li Iraqê rastî îşkence û tevgerên xirab hatin ku di nav de lêdana dijwar, dayîna şokên elektrîkê û şîdeta zayendî hebû; û kesê heftemîn jî ji ber gefa îşkenceyê îtirafa sûcan kirin. Malbatên her 6 zilamên ku îşkence li wan hatiye kirin, gotin ku armanca îşkenceyê ew e ku bi zorê îtirafê ji wan bistînin. Çar ji van kesan niha li benda pêkanîna îdamê ne. Ji van çar mirovan du kes di çarçoveya peymana ku ji aliyê hevpeymaniya bi pêşengiya DYê, HSDê û rayedarên Iraqî ve hatibû qebûlkirin de piştî Rêbendana 2022an hatin veguhestin.

Yek ji van mêran di sala 2021an de li kampa Al-Holê li gel komek zilamên din ên Iraqî ji aliyê HSDê ve hatibû girtin. Berî ku di Hezîrana 2022an de li gor peymana nû ya veguhestinê bi karwanekê ve ji bo Iraqê were şandin, ew li Panoramayê hat ragirtin. Xwişka wî, Zina, got ku ew şandin Mûsilê û piştre jî ew birin navendeke desteserkirinê ya li Bexdayê. Wî ji Zinayê re got ku ew bi qasî mehekê rastî îşkenceya rojane hatiye, dayîna şokên elektrîkê ya bi tebanceyên şokê jî di nav de, berî ku ew di dawiyê de bi zorê îtiraf bike ku ew girêdayî DAIŞê ye. Zina ji Rêxistina Efûya Navneteweyî re wiha got: "Di lêpirsînê de ew… neçar kirin ku tiştên ku haya wî jê tune bû bibêje… Bê ku parêzerekî bidin birayê min Dadger biryara xwe da, û di nav du hefteyan de cezayê îdamê dan wî, bê yî îtiraz. Di yek rûniştinê de dadgehê biryar da… ji 10 deqeyan kêmtir bû." Niha li benda îdamê ye.

JI BO QURBANIYÊN SÛCÊN KOMA ÇEKDAR A DEWLETA ÎSLAMÎ TU DADWERÎ BI CIH NEHATIYE

Ev pergala desteserkirinê ne bi tenê mafên kesên ku tê de girtî ne bin pê dike, di heman demê de dadmendî, rastî û tazmînatê ji bo qurbaniyên sûcên DAIŞê jî peyda nake. Li bakur-rojhilatê Sûriyeyê gelek mirov bi hinceta endamtiya DAIŞê tên girtin. Di gel vê yekê jî, pênc sal piştî têkçûna herêmî ya DAIŞê, hê jî rayedarên xweser û civaka navdewletî berpirsên wan sûcên cur bi cur ên li gor qanûnên navdewletî bi dest nexistine.

Rayedarên payebilind ên rêveberiya xweser gotin ku bala Dadgeha Parastina Gel li ser dadgehkirina endamên DAIŞê ye ku li dijî HSD an jî dijî hêzên hikûmeta Sûriyeyê şer kirine. Tu kes ji wan mirovên ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine girtin, ji ber tawanên li gorî qanûnên navdewletî, ku di nav de tawanên şer, tawanên li dijî mirovatiyê û tawanê komkujiyê hene, nehatine lêpirsînkirin û dadgehkirin. Dozgerî bi piranî ji ber tawanên ku di bin navê "terorîzmê" de ya bi wateyeke berfireh tên pênasekirin hatine meşandin. Gelek tawanên giran ên ku ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin, bi taybetî yên ku rasterast bi şer ve girêdayî nehatine dîtin, tawanên wekî koletiya seksî û tawanên din ên li ser bingeha zayendî, qet nehatine lêkolînkirin. Qurbaniyên tawanên DAIŞê û kesên ji wan rizgarbûyî kêm agahiyan werdigirin û derfeta wan gelek kêm e ku beşdarî dadgehan bibin. Rêveberê Weqfa Êzdiya Azad Parî Ibrahîm derbarê rewşê de wiha got: "Sûcdarên endamên DAIŞê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ji ber tawanên ku pêk anîne nayên darizandin, ji ber ku civaka navdewletî ji berpirsiyariya xwe dûr ketiye û rayedarên xwecihî jî ji hêla kapasîte û çavkaniyên ve xwedî kêm derfet in da ku hejmareke mezin a darizandinên qanûnî yên tevlihev bimeşînin."

ÇALAKIYA PÊWÎST

Nêzikî pênc sal piştî têkçûna herêmî ya DAIŞê, rayedarên xweser û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê nekarîn mafên wan kesên ku di pergala desteserkirinê ya li bakur-rojhilatê Sûriyeyê de ne û mafên kesên ji DAIŞê rizgarbûyî misoger bikin, û ew rewş hem ji bo kesên di nav pergala desteserkirinê de ne û hem jî ji bo sed hezaran kesên rizgarbûyî yên li herêmê derbasdar e. Divê ew demildest tevbigerin da ku vê kêmasiyê çareser bikin.

Divê HSD û hêzên girêdayî wê li navendên binçavkirinê yên ku di bin kontrola wan de ne demildest dawî li hemû îşkence û tevgerên xirab bînin, divê şert û mercên nemirovane yên ku bûne sedema mirina girseyî û êş û azarên giran ji holê rakin. Divê hikûmeta DYê û endamên din ên hevpeymaniya bi pêşengiya DYê hemî hêza xwe bi kar bînin da ku dawî li van binpêkirinan bînin.

Divê hikûmeta DYê pabendî prensîba qanûna navdewletî ya nevegerandinê be, ji bo vê yekê jî divê radestkirina mirovan a ji bo HSDê û veguhestina mirovên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ya ji bo Iraqê û veguhestina mirovên Saudî ya ji bo Erebistana Saudî rawestîne, ji ber ku li wan dewletan dibetiya îşkence û cezayê mirinê heye.

Piştî avêtina van gavên lezgîn, divê rayedarên xweser, hikûmeta DYê û endamên din ên hevpeymaniyê stratejiyeke berfireh pêş bixin da ku pergala desteserkirinê ya li bakur-rojhilatê Sûriyeyê li gor qanûnên navneteweyî bimeşe. Wekî beşeke vê stratejiyê, divê ew pêvajoyeke vekolînê saz bikin da ku hemî kesên ku bi awayekî şênber kifşe ye ku wan sûcek li gor qanûnên navneteweyî an jî sûcê şîdetê yên li gor qanûnên navxweyî, ku bi qanûnên navneteweyî yên mafên mirovan re hevaheng e, pêk neanîne serbest berdin. Gelek mirov hene ku divê demildest rewşa wan bê lêkolînkirin û bên serbestberdan, ji ber ku tu bingeha wan a desteserkirinê tune ye. Di nav wan mirovan de bi qasî 9,000 kesên ku berî şerên dawî yên bi DAIŞê re li kampa Al-Holê bûn, Êzdiyên rizgarbûyî û qurbaniyên din ên tawanên DAIŞê hene.

Wekî xala dawî jî, divê Neteweyên Yekbûyî bi pêşengiya Sekreteriya Giştî ya NYê, bi hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û bi rayedarên xweser re bixebite da ku pêvajoyek vekolînê saz bike ku hemî kesên ku bi awayekî maqûl ne gumanbar in ku sûcek li gorî qanûnên navneteweyî kirine, an jî tawanek tundiyê li gor qanûnên navxweyî ku bi qanûnên navneteweyî yên mafên mirovan re hevaheng e nekiribin bi lez bên kontrolkirin û berdan. Di nav wan kesan de ku pêwîstî bi venêrîna lezgîn a rewşa wan heye, gelek kesên ku tu carî bingehek ji bo binçavkirina wan tunebû jî cih digirin, ku di nav de bi hezaran kesên ku beriya şerên dawî yê bi DAIŞê re li kampa Al-Holê bûn, rizgarbûyên Êzdî û qurbaniyên din ên tawanên DAIŞê jî hene. NY di heman demê de divê xebatan bike da ku çareseriyên dadwer ji vê qeyranê re peyda bike û bi vî awayî berpirsiyariya tawanên hovane yên ku ji hêla DAIŞê ve hatine kirin diyar bibin.

RÊBAZ

Tîmeke lêkolîner a girêdayî Rêxistina Efûya Navneteweyî di maweya du salan de, ji Adara 2022an heya Sibata 2024an, ji bo vê raporê lêkolîn kirin. Lêkolîner ji 24ê Îlonê heya 8ê Cotmeha 2022an, ji 25ê Sibatê heya 11ê Adara 2023yan, û ji27 Tîrmeh heta 6ê Tebaxa 2023yan bi tevahî sê caran çûn bakur-rojhilatê Sûriyeyê.

Ev rapor li ser bingeha hevpeyvînên rû bi rû û ji dûr ve yên bi kesên ku niha yan jî berê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ji ber gumana têkiliya wan a bi DAIŞê re girtî bûn hatiye amadekirin; hevpeyvînên rû bi rû û yên ji dûr ve bi pêkhateyên din re jî hatine kirin, ku di nav wan de nûnerên rayedariya xweser ên bakur-rojhilatê Sûriyeyê, hikûmeta DYê û ajansên Neteweyên Yekbûyî hene; û her wiha raporê ji vekolîna rapor û materyalên din ên Neteweyên Yekbûyî, yên rêxistinên sivîl û dewletên têkildar jî sûd wergirtiye. Rêxistina Efûya Navneteweyî ji bo vê raporê bi gişt bi 314 kesan re hevpeyvîn çê kir.

HEVPEYVÎNÊN LI GEL MIROVÊN KU LI AVAHÎ Û KAMPÊN DESTESERKIRINÊ TÊN GIRTIN

Di pêvajoya lêkolîna xwe de Rêxistina Efûya Navneteweyî li 10 avahiyên desteserkirinê hevpeyvînên rû bi rû yên yekcarî û zêde carî çê kirin, – ku di nav de avahiyên desteserkirinê yên ku rêveberiya wan li nav destê Hêzên Demokratîk ên Suriyeyê (HSD), Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), û Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Suriyeyê (RXDBRS) ye jî hene.[1] Ev avahî û navend ên li jêr in:

1. Girtîgeha Navendî ya Alaya (RXDBRS);
2. Avahiya desteserkirinê ya Al-Shaddadi (HSD);
3. Girtîgeha Navendî ya Jinan a Derekê (RXDBRS);
4. Girtîgeha Navendî ya Xwêran (RXDBRS);
5. Girtîgeha Hesekê ya Jinan, navenda xudankirinê ya Halat jî di nav de (YPJ);
6. Navenda "Rehabîlîtasyonê" ya Hûrî (RXDBRS);
7. Navenda "Rehabîlîtasyonê" ya Orkeş (RXDBRS);

1 Avahiyên piştî-darizandinê ji hêla RXDBRSê ve wekî "Navendên Reform û Rehabîlîtasyonê" tên binavkirin. Hevpeyvîna rû bi rû ya bi hevserokên Ofîsa Dadwerî û Rehabîlîtasyonê ya Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê, 2yê Cotmeha 2022an, Qamişlo.

8. Avahiya desteserkirinê ya Panorama (“Al-Sina’a”) (HSD);[2]
9. Girtîgeha Navendî ya Raqqayê (RXDBRS); û
10. Girtîgeha Navendî ya Jinan a Raqqayê (RXDBRS).

Ji bilî pêkanîna hevpeyvînên li avahiya desteserkirinê ya Panoramayê, lêkolînerên Rêxistina Efûya Navneteweyî di Tebaxa 2023an de serdanek li avahiyê pêk anîn, û rayedaran derfet çê kirin da ku ew klînîka avahiyê û her wiha hin hucreyên ku nedihatin bikaranîn û hin cihên li derve jî bibînin ku girtî di nava rojê de ji bo demeke sînorkirî diçûnê.

Rêxistina Efûya Navneteweyî her wiha hevpeyvînên ji dûr ve jî pêk anî bi wan kesên ku ji sala 2014an û pê ve ji aliyê rayedarên xweser li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ji ber gumana têkiliyê ya bi DAIŞê re hatibûn girtin û piştre hatibûn berdan.

Bi tevahî, Rêxistina Efûya Navneteweyî bi 78 kesên ku bi endamtiya DAIŞê hatine tawanbar kirin, ên ku niha yan jî berê di girtîgehên bakurê rojhilatê Sûriyê de hatine ragirtin, hevpeyvîn çê kir. Di nav wan mirovan de 33 mêr, 21 jin û 24 zarok an jî ciwan hebûn ku temenê wan di bin 18 saliyê de bûn dema ku cara yekem ji aliyê rayedarên xweser ve hatin binçavkirin. Ji wan 51 kes Sûriyeyî, 6 Iraqî û 21 jî welatiyên din ên biyanî ne.3 Rêxistina Efûya Navneteweyî bi sê endamên malbatê re hevpeyvîn çê kir ku xizmên wan niha ji aliyê desthilatdarên xweser ve bi tawana têkiliya bi DAIŞê re girtî ne.

Di serdana lêkolînê ya duyemîn a Rêxistina Efûya Navneteweyî de, ya di Sibat û Adara 2023an de, rayedarên xweser destûr dan Rêxistina Efûya Navneteweyî ku dosyeyên mêrekî, jinekê û zarokekê ku bi sûcên girêdayî têkiliya wan bi DAIŞê re hatine sûcdarkirin binirxîne, û ew dosye ji aliyê rayedarên xweser ve hatibûn bijartin ji bo ku Rêxistina Efûya Navneteweyî çend mînakên temsîlî bibîne û binirxîne. Rêxistina Efûya Navneteweyî nekarî bi awayekî serbixwe piştrast bike ka gelo ev doz dibin mînakên temsîlî. Rêxistina Efûya Navneteweyî di heman demê de çavdêriya rûniştina dadgehê ya kesekî jî kir ku bi girêdana bi DAIŞê re dihat tawanbarkirin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî serdana du kampên desteserkirinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê kir, ku tê de kesên ku bi gumana têkiliya wan a bi DAIŞê re tên ragirtin dimînin: ev jî kampa Al-Hol û kampa Roj in. Li kampa Al-Holê, Rêxistina Efûya Navneteweyî bi şeş mêr û deh jinan re hevpeyvîn çê kir, ku çardeh ji wan Sûriyeyî û du ji wan Iraqî bûn. Li kampa Al-Holê bi welatiyên biyanî yên din re hevdîtin nehat çêkirin. Li kampa Rojê, Rêxistina Efûya Navneteweyî bi 32 jinan re hevpeyvîn çê kir, ku du ji wan Sûriyeyî, du ji wan Iraqî û 28 ji wan hemwelatiyên biyanî ne. Li kampa Al-Hol û Rojê Rêxistina Efûya Navneteweyî bi kesên ku

2 “Panorama”, avahiyeke desteserkirinê ya ku ji hêla hevpeymaniya bi pêşengiya DYÊ li bajarê Hesekê hat çêkirin, di sala 2022yan de temam bû û li ser xîmê dibistaneke berê wekî girtîgeh hat avakirin. Ev girtîgeh ji hêla partîyan û di medyayê de bi navên wekî avahiya desteserkirinê ya “Al-Sina’a”, “Xwêran” an jî “Hesekê” tê binavkirin. Ji bo vê raporê, Rêxistina Efûya Navneteweyî bi navê “Panorama” qala vê avahiyê dike, lewre rayedarên xweser jî vê navê bi kar tînin. Dema ku qala tesîsa girtîgehê ya ku berî dibistan bû tê kirin, rêxistin navê “Panorama / Al-Sina’a” bi kar tîne. Ev girtîgeh di Rêbendana 2022yan de bû armanca êrîşeke mezin.

3 Welatiyên ku ne-Sûriyeyî û Ne-Iraqî yên li bakur-rojhilatê Iraqê gelek caran wekî “hemwelatiyên welatên sêyem” tên binavkirin. Ji bo vê raporê, Rêxistina Efûya Navneteweyî terma “welatiyên biyanî” bi kar tîne da ku qala mirovên ne-Sûriyeyî û yên ji Iraqê û yên ji welatên din bike. Di gelek rewşan de, ev rapor dema ku qala welatiyên biyanî yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê dike hejmara Iraqiyan jî diyar dike, ji ber ku Iraqî komeke gelek zêde ne pêk tînin.

ji aliyê rayedarên kampê ve hatin hilbijartin re axivî. Nûnerên Rêxistina Efûya Navneteweyî her wisa li dora kampa Rojê jî geriyan û bi kesên ku dixwestin bi delegeyan re biaxivin re hevpeyvîn çê kirin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi şeş endamên malbatê yên mêr û xortên Iraqî yên ku ji navendên desteserkirinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bo desthilatdarên Îraqî hatibûn veguhestin, hevpeyvîn çê kir. Rêxistina Efûya Navneteweyî her wiha hevpeyvîn bi rayedarekî Iraqî re çê kir ku bi hevpeymaniya bi pêşengiya DYê re kar dike û rasterast beşdarî veguhestina Iraqiyan a ji bakur-rojhilatê Sûriyê ji bo Îraqê dibe û di heman demê de bi rayederakî hikûmetê yê berê re jî axivî yê ku li ser girtina kesên ku li Iraqê bi gumana têkildariya bi DAIŞê re desteserkirî peywirdar e.

Piraniya hevpeyvînan bi alîkariya wergera ji Erebî an jî Kurdiya Kurmancî bo Îngilîzî hatine çêkirin. Hevpeyvînên mayî bi Îngilîzî, bê şirove hatin çêkirin. Wergêr tev ji aliyê Rêxistina Efûya Navneteweyî ve hatin diyarkirin.

Ji bo hemî hevpeyvînên ku li navendên desteserkirinê û kampên li bakur-rojhilatê Sûriyê hatine kirin, rayedarên xweser destûr dane Rêxistina Efûya Navneteweyî ku hevpeyvînên taybet û nehênî pêk bîne. Hevpeyvînên li navendên desteserkirinê ji hêla desthilatdarên xweser ve li ser pîvanên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî pêşkêş kirin, an ku li gor pîvanên wekî temen an jî neteweya girtiyan, hatin diyarkirin. Bi piranî, rayedarên xweser destûr dan Rêxistina Efûya Navneteweyî da ku bêyî astengkirina demê hevpeyvînên dirêj pêk bîne. Ji bo hin hevpeyivînan, nûnerekî desthilatdariya xweser ji dûr ve, ji dûrahiyeke bi têrê ku nebihîzin, bi sedema tedbîrên ewlehiyê hevpeyvîn temaşe kir.

Rayedarên xweser li bakur-rojhilatê Sûriyeyê di her sê serdanan de jî gelek hevkarî kirin ji bo pêkanîna daxwazên berfireh ên Rêxistina Efûya Navneteweyî yên ji bo serlêdana navendên desteserkirinê û kampan, ku di nav wan de navendên binçavkirinê û kampên cuda hebûn. Rayedaran her wiha di Tebaxa 2023an de ji bo hevpeyvînên şopandinê yên li kampa Rojê hêsanî çê kirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî spasiya hewldanên rayedarên otonom dike ji bo ku rêxistin karibe hevpeyvînên dirêj, nehênî û li gor standardên çavdêriya mafên mirovan ên navneteweyî pêk bîne.

Rêxistina Efûya Navneteweyî li ser taybetî û armanca lêkolînê û rêbaza bikaranîna daneyan agahdarî da hemî kesên ku beşdarî hevpeyvînan bûn. Lêkolîneran berî hevpeyvînê ji her kesî razîbûna devkî wergirtin. Ji her mirovî re hat gotin ku ew dikarin di her kêliyê de hevpeyvînê biqedînin û dikarin bersiva pirsên taybet nedin. Rêxistina Efûya Navneteweyî di berdêla axaftinê de tu soz û teşwîq nedan kesên ku beşdarî hevpeyvînê bûn.

Hema her mirovê girtî yê ku bi wan re hevpeyvîn hatiye çêkirin, ji ber fikara ewlekariya xwe an jî ewlehiya endamên malbata xwe, daxwaza veşartina navê xwe kirin. Di encamê de Rêxistina Efûya Navneteweyî di vê raporê de navên wan hemiyan guhert û kir navên anonîm. Ji bo parastina nasnameya wan, dîrok û cihên rast ên hevpeyvînan nehatine diyarkirin. Navên piraniya nûnerên rayedarên xweser jî ji ber metirsiyên taybet ên ku ew rû bi rû ne, ku di nav de metirsiya ji DAIŞê û Tirkiyê jî heye, hatin derxistin. Navên çend

xebatkarên rêxistinên sivîl ên navneteweyî û neteweyî jî li ser daxwaza wan, ji bo parastina nenasî û ewlehiya wan a karkirinê a li bakur-rojhilatê Sûriyeyê, hatine derxistin. Gelek caran jî dîrokên hevpeyvînên bi nûnerên rayedarên xweser, xebatkarên Rêxistinên Sivîl ên Derveyî Hikumetê, rayedarên Neteweyên Yekbûyî û pisporên din re hatine binavkirin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî di hemî hevpeyvînan de tedbîrên xwe girtin da ku kêşeyên nû çê nebin ji bo wan kesan ku bi wan re hevpeyvîn hatin çêkirin. Ji bo zarokan, hevpeyvînên rû bi rû li cihên ewle û nepenî hatin kirin. Bi zarokên di bin 14 salî re hevpeyvîn nehatin çêkirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî destûr da û teşwîq kir ku zarok rêberiya niqaşê bikin û dema ku nîşanên nerehetî an jî tengeşeyê çê bûn jî, wan pirs guhertin li ser mijarên kêm hesas. Rêxistina Efûya Navneteweyî misoger kir ku hevpeyvîn li ser rewşa heyî ya zarokê û li ser mijarên erênî bi dawî bibin. Rêxistina Efûya Navneteweyî di destpêka hevpeyvînê de ji wan re diyar ku kengê bixwazin ew dikarin hevpeyvînê rawestînin an jî di her kêliyê de dikarin navberê bidin, û ji bilî vê yekê jî, di her kêliyê de ji zarokan pirsî ka gelo ew dixwazin berdewam bikin. Ji bo hemû hevpeyvînên ku li ser mijarên tundiya zayendî pêk hatin, lêkolîner li gor Koda Reftarê ya Cîhanî ya ji bo Komkirin û Bikaranîn Agahiyên Derbarê Tundiya Zayendî ya Sîstematîk û Têkildarî Pevçûnan (Koda Murad) karên xwe pêk anîn.

HEVPEYVÎNÊN LI GEL RAYEDARÊN XWESER Û RAYEDARÊN HIKUMETÊ

Rêxistina Efûya Navneteweyî li bakur-rojhilatê Sûriyeyê li gel 39 nûnerên rêveberiya xweser hevdîtin çê kirin ku di naw wan de ew hene: General Mazlûm Ebdî, Fermandarê Giştî yê HSDê; General Newroz Ehmed, hevseroka hêzên HSDê û serfermandara YPJê; nûnerên îstixbarata leşkerî yên HSDê; rayedarê payebilind ê Hêzên Ewlehiya Navxweyî; seroka îstixbarata YPJê; nûnereke ofîsa têkiliya gel a YPJê; hevserokên Ofîsên Reform û Rehabîlîtasyonê; hevserokên Meclîsa Dadweriya Civakî; hevserokên Dadgehên Gel ên Parastinê; hevserokên Rayedariya Karên Derveyî; endamê rêveberiyê yê Rayedariya Karên Derveyî û serokê Rêveberiya Karên Mirovî; nûnerên din ên Rêveberiya Karên Derveyî; dezgeha Komîteya Jinan a li Herêma Cizîrê; nûnerên Ofîsa Kordînasyonê ya Şêwirdaran (OKŞ); nûnerên Ewropa û Cenovayê yên li RXDBRSê; nûnerên Meclîsa Malbatên Şehîdan; û hevserok û rêveberên hemî avahiyên desteserkirinê, navendên «rehabîlîtasyonê» yên ciwanan û kampên ku Rêxistina Efûya Navneteweyî serlêdana wan kir.Bi ser de jî, Rêxistina Efûya Navneteweyî hevpeyvîn li gel sîxurekî kir ku li Al-Kasrahê dixebitî dema ku li avahiya desteserkirinê mirovên bi gumana têkiliyê ya bi DAIŞê re heyî dihatin girtin.

Rêxistina Efûya Navneteweyî her wisa li gel 17 rayedarên hikûmetê jî hevdîtin pêk anîn ku li ser rewşa bakur-rojhilatê Suriyeyê xebatan dimeşînin. Ji ber ku hevdîtin veşartî bûn, di vê raporê de qala wan nehatiye kirin.

HEVPEYVÎNÊN LI GEL HEVKARÊN DIN

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi du nûnerên Komîteyên Eşîran hevpeyvîn çê kir ku li ser ji nû ve entegrekirina kesên ku bi gumana têkiliya bi DAIŞê girtî ne xebatan dikin; bi nûnerên çar rêxistinên mafên Êzdiyan û çalakvanekî din ê mafên Êzdiyan re hevpeyvîn çê kir; bi 53 xebatkarên rêxistinên sivîl ên neteweyî û navneteweyî re axivî, ku di nav wan de komeke sereke ya ya neteweyî ya mirovên rizgarbûyî jî heye. Rêxistina Efûya Navneteweyî her wiha bi 25 nûnerên Netewên Yekbûyî re axivî, ku di nav wan de Raportorê Taybet ê ji bo Bazirganiya Mirovan, bi taybetî Bazirganiya Jin û Zarokan, û nûnerên Nûnertiya Taybet ê Sekreterê Giştî ê ji bo Tundiya Zayendî ya di Pevçûnan de, Komîseriya Bilind a NY a Penaberan UNHCR), Ofîsa Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî (OHCHR), Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF), Ofîsa Koordînasyona Karên Mirovî ya Neteweyên Yekbûyî (OCHA), Ofîsa Neteweyên Yekbûyî ya Dijî-Terorîzmê (UNOCT), Rêvebiriya Komîteya Dijî Terorê ya Neteweyên Yekbûyî (CTED), Tîma Vekolînê ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Pêşxistina Berpirsiyarkirina Tawanên ku ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin (UNITAD), Mekanîzmaya Navneteweyî, Bêalî û Serbixwe ya ji bo Sûriyeyê (IIIM), û Komîsyona Lêkolînê ya Komara Erebî ya Sûriyeyê. Rêxistina Efûya Navneteweyî her wiha bi 6 rojnamevan û 7 pisporên serbixwe re axivî ku rewşa li bakur-rojhilatê Sûriyeyê dişopînin.

LÊKOLÎNÊN DIN

Rêxistina Efûya Navneteweyî têkildarî rewşa girtiyên ku li avahiyên desteserkirinê yên Sini û Panoramayê hatine girtin dîmenên peykê yên gorên komî yên potansiyel nirxandin; Vîdeoyên ku ji aliyê YPJê ve tên pêşkêşkirin ên têkildarî sûcên ku ji aliyê kesên ku wekî têkildarî DAIŞê tên naskirin; û vîdeoyên ku nûnerê Dadgeha Parastina Gel şandine yên têkildarî gefên ku li dadgeran dikin. Rêxistina Efûya Navneteweyî her wiha vîdeoyên têkildarî "raçavkirina" kesên ku di dawiya sala 2018an û destpêka 2019an de ji herêma dawî ya di bin destê DAIŞê de direviyan jî nirxand, ku ji arşîveke dîjîtal a li Navenda Dad û Berpirsiyariyê ya Sûriyeyê (SJAC) ve hatin peydakirin. Rêxistina Efûya Navneteweyî di heman demê de raporên medyayê, yên dewlet, rêxistinên sivîl û saziyên Neteweyên Yekbûyî jî nirxand ku wekî raporên Komîsyona Lêpirsînê ya Neteweyên Yekbûyî ji bo Komara Erebî ya Sûriyeyê û Raporterê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî yê ji bo pêşvebirin û parastina mafên mirovan û azadiyên bingehîn di dema rûbirûbûna terorê de hatibûn amadekirin. Her wisa raporên sê mehane yên ku Serperiştê Giştî li ser Operasyona ji bo Çareseriyê ji Kongreya DYê re ji sala 2015an heya îro amade kirine jî hatin nirxandin.

TERMÎNOLOJÎ

Di vê raporê de, "zarok" li gor qanûnên navneteweyî ji bo kesên di bin 18 saliyê de tê bikaranîn. Hin kesên ku di hevpeyvînan de axivîn temenê xwe yê tam nezanin û hin zarok û xortên Suriyeyî jî bi tenê sala jidayikbûna wan bi fermî ji aliyê malbatên wan ve hatine tomarkirin. Lekolîneran dema ku axaftvanan bi zelalî temenê xwe diyar kirin, hingê ew wekî zarok pênase kirin.

Mîsyona leşkerî ya Hevpeymaniya Navneteweyî ya li dijî DAIŞê, ku bi fermî wekî «Hêza Peywira Hevpar a Yekgirtî - Tevgera Biryardariya Xwezayî “ tê binavkirin, di vê raporê de wekî “Hevpeymaniya bi pêşengiya DYê” tê binav kirin. Hevpeymanî wekî “bi pêşengiya DYê” tê binavkirin, her wekî ku di weşanên Rêxistina Efûya Navneteweyî ya berê de jî hatibû binavkirin, ji ber ku hikûmeta DYê endamê herî bibandor ê hevpeymaniyê ye, û ji bo stratejî, pîlansazî, çavkanî û biryardayînê pêşengiyê dike.4

“HSD û hêzên ewlehiyê yên girêdayî wê” hêzên HSDê destnîşan dike, ku di nav de Hêzên Yekîneyên Antî-Teror (YAT) û Komandoyên HSDê, û her wiha komên Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên herêmê (HEH), ku di nav de Asayişa Giştî, û Hêzên Antî-Terorê (HAT) cih digirin.5 Her wekî li jêr bi hûrgilî tê destnîşankirin, HSD, koma wan a jin a bi serokatiya YPJ û HEHê çend avahiyên desteserkirinê kontrol dikin ku tê de kesên bi gumana girêdayî DAIŞê tên girtin. Wisa xuya ye ku HSD û HEH di van saziyan de bi hev re dixebitin.6

Ji bo kesên ku bi gumana têkiliya bi DAIŞê re li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ne, du cihên sereke hene ku tê de mirov ji azadiya xwe bêpar in: avahiyên desteserkirinê û kampên desteserkirinê. Terma “avahiya desteserkirinê “ ji bo avahiyên ku tê de kesên gumanbar tên girtin tê bikaranîn, û ew avahî ji hêla rêveberiyên xweser ên bakur-rojhilatê Sûriyeyê ve tên rêvebirin ku di nav de HSD, hêzên ewlehiyê yên girêdayî wê û RXDBRSê hene. Terma “kampên desteserkirinê” ji bo kampên Al-Hol û Rojê tê bikaranîn. Demên berê, Al-Hol û Roj ji aliyê gelek aktoran ve wekî kampên alîkariya mirovî, kampên mirovên bêcihûwarkirî yên navxweyî, kampên koçberan, kampên penaberan, “kampên wekî-zindan” û “kampên girtî” dihatin binavkirin. Rêxistina Efêya Navneteweyî terma “kampên desteserkirinê” bi kar tîne ji ber ku li gor baweriya Rêxistinê ew baştirîn term e ji bo kampên ku tê de mirov ji azadiya xwe bêpar in û bi awayekî keyfî têne girtin.7

MAFÊ BERSIVDAYÎNÊ

Di 8ê Adara 2024an de, Rêxistina Efûya Navneteweyî encamên sereke yên ku di vê raporê de hatine diyarkirin bi nameyan ji rayedarên xweser û her wiha ji Wezareta Derve ya DYê û ji Meclîsa Ewlekariya Neteweyî ya DYê re ragihand. Di 11ê Adarê de nameyên dîtir ji Wezareta Parastinê ya DYê re, ji Ofîsa Karên

4 Hevpemaniya Navneteweyî ya li dijî DAIŞê ji 86 dewletên endam pêk tê. Hêza Peywira Hevpar a Yekgirtî – Tevgera Biryardariya Xwezayî, ji leşkerên 29 dewletan pêk tû û ji hêla Wezareta Parastinê ya DYê ve hat damezrandin. Ji bo bêtir agahiyên derbarê Hêza Peywira Hevpar a Yekgirtî û Hevpeymaniya bi pêşengiya DYê li beşa 1.2 û Beşa 2. binêrin.

5 HEH (ISF), ku berê wekî Asayiş dihat binavkirin, hin peywirên ewlekariyê bi cih tîne li bakur-rojhilatê Sûriyeyê û bala xwe dide ewlehiya navxweyî û karê polîsiyê. Ji şeş şaxan pêk tê: polîsê trafîkê, hêzên dijî terorê, HEHa Jinê, ewlehiya cihên lênêrînê, ewlehiya giştî û ewlehiya dijî sûcên-organîze. Ji bo bêtir hûrgiliyan binêrin: European Union Agency for Asylum (EUAA), “Syrian Democratic Forces and Asayish”, https://euaa.europa.eu/country-guidance-syria-2023/33-syrian-democratic-forces-and-asayish (27 December 2023).

6 Hêza Peywira Hevpar a Yekgirtî terma “Hêzên Ewlehiya Hundirîn a Bajarî” bi kurteya (PRISF) bi kar tîne dema ku qala wan hêzan dike û diyar dike ku dema ew bi cih dibin ew piranî vedikişin, û bi awayî jî berevajî Hêzên Ewlehiya Hundirîn in, û ji komên nîştecihî pêk tên û kompozisyona etnîk a herêmê jî didin kifşê. Li gor CJTF-OIRê, PRISF piranî di girtîgehên HSDê de karê ewlehiyê bi cih tîne. Rayedarên xweser terma “PRISF” bi kar neanîn di hevdîtinên xwe yên li gel Rêxistina Efûya Navneteweyî û lewre di vê raporê de ev term nehat bikaranîn. Ji bo bêtir hûrgiliyên derbarê PRISFê, binêrin: Lead Inspector General, Operation Inherent Resolve Quarterly Report to the US Congress, April - June 2019, https://media.defense.gov/2019/Aug/09/2002169448/-1/-1/1/Q3FY2019_LEADIG_OIR_REPORT.PDF, p. 29 and Lead Inspector General, Operation Inherent Resolve Quarterly Report to the US Congress, April - June 2020, https://media.defense.gov/2020/Aug/04/2002470215/-1/-1/1/LEAD%20INSPECTOR%20GENERAL%20FOR%20OPERATION%20INHERENT%20RESOLVE%20APRIL%201,%202020%20-%20JUNE%2030,%202020.PDF, p. 65.

7 Ji bo bêtir hûrgiliyan derbarê analîzên fermî yên têkildarî bêparkirina ji mafê azadiyê ya li kampên Al-Hol û Roj, Beşa 6 û 10an binêrin.

Derve, Yekîtiya Gelan û Pêşketinê ya QYê re û di 21ê Adara 2024an de ji serokwezîrê Iraqî re hat şandin. Rêxistina Efûya Navneteweyî di heman demê de bi rayedarên hikûmeta DYê re û bi rayedarên xweser re li ser encaman hevdîtinên dûredûr û rû bi rû çê kirin û derfet ji wan rayedaran re çê kirin ku bikarin pirsan bikin û bersivên xwe pêşkêş bikin. Bersivên nivîskî ji rayedarên xweser û hikûmetên DYê, QYê û Iraqê hatin wergirtin. Ev bersiv li seranserê vê raporê têne referans kirin û di dawiya raporê de bi tevahî di çar pêvekan de cih digirin.

SPASDARÎ

Ev rapor bêyî kesên rizgarbûyî yên qurbaniyên binpêkirinên mafên mirovan temam nedibû eger ku wan ezmûnên xwe bi Rêxistina Efûya Navneteweyî û rêxistinên ku alîkariya wan dikin re parve nekirana.

Rêxistina Efûya Navneteweyî bi taybetî spasiya Navenda Dadwerî û Berpirsiyariyê ya Sûriyeyê (SJAC), Tora Sûriyeyê ya Mafên Mirovan (SNHR), û çend çavdêrên derve dike, ku di nav wan de takekesên wekî Sareta Ashraph, Jayne Huckerby, John Chappell, Fionnuala Ní Aoláin, û Anne Charbord hene.

ENCAM Û PÊŞNIYAZ

ENCAM

Li bakur-rojhilatê Sûriyeyê desteserkirina zêdetirî 56,000 mirovan a ji aliyê rêveberiya xweser ve ya ji ber gumana têkiliya bi DAIŞê re qeyraneke mafên mirovan e. Kesên ku di vê pergala desteserkirinê de dimînin rastî windakirina bi zorê, îşkence û tevgerên xirab tên. Bi sedan kes ji ber îşkence û şert û mercên nemirovî yên girtinê mirine. Piraniya kesên ku di vê pergala desteserkirinê de ne, bi binpêkirina qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî û hiqûqa navneteweyî ya mirovî, bê dadgehkirin, bi awayekî domdar tên girtin.

Bi qasî 14,500 mirovên ku di nav vê pergala desteserkirinê de jinên temen mezin in, û nêzikî 30,000ên wan zarok in, ku gelek ji wan ji ber kiryarên mêrên malbata xwe hatine desteserkirin. Jin di nav vê pergala desteserkirinê de rastî tundiya zayendî tên, jin û zarokên wan di bin metirsiya veqetandina bi darê zorê de dijîn, û bi heman awayî dema kurên hemwelatiyên biyanî dibin xort, wan jî ji kampê derdixin. Nêzikî 1,000 kur û mêrên ciwan ên ku wekî kur hatine binçavkirin li navendên binçavkirinê tên ragirtin, û sedî 80% yê wan jî di nav avahiyên mezinan de dimînin.

Ev pergal qurbaniyên DAIŞê neçar dihêle. Ji bilî hejmarek sînordar a Iraqiyan, li bakur-rojhilatê Sûriyeyê tu welatiyên biyanî ji ber tawanên xwe nehatine dadgehkirin. Dadgehkirina hemwelatiyên Sûriyeyê ya ji ber tawanên nezelal ên girêdayî terorê ku di Dadgehên Parastina Gel de pêk tên, edaletê, rastiyê û tezmînatê dabîn nake. Ji bo sûcên li gor hiqûqa navneteweyî, ku di nav wan de kiryarên koletiya zayendî û sûcên din ên li ser bingeha zayendî hene, tu darizandin nehatine kirin. Beşek girîng ji jin, zarok û xortên di pergala desteserkirinê de qurbaniyên tawanên DAIŞê ne li gor yasayên navdewletî, yan jî bûne qurbaniyên bazirganiya mirovî ya sîstematîk a DAIŞê.

Civaka navneteweyî pir kêm tişt kirine ji bo çareserkirina vê qeyrana mafên mirovan û peydakirina piştgirî û çareseriyan da ku dadmendiyê ji bo qurbaniyên DAIŞê misoger bike û di heman demê de mafên mirovî yên kesên ku bi girêdana bi DAIŞê re tên tawanbar kirin jî misoger bike. Di şûna wê de, hemî bar û zehmetî ji rayedarên xweser re hatiye hiştin - ku ew rêveberî wekî aktorek ne-dewletî bi çavkaniyên kêm û

di çarçoveya pevçûnên domdar de tevdigere. Gelek dewletan hemwelatiyên xwe, ku di nav wan de zarok û qurbaniyên bazirganiya mirovî (ku hin ji wan jî zarok in) jî hene, ên ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi awayekî bêdem tên girtin bi tena serê xwe hiştine.

Hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û bi taybetî jî hikûmeta DYê di piraniya beşên vê pergala desteserkirinê de cih digire. Hêzên hevpeymaniya bi pêşengiya DYê operasyonên hevbeş bi HSD û hêzên ewlekariyê yên girêdayî wê re bi berdewamî dimeşînin, ku di encamê de hin mirovên ku bi gumana têkiliya bi DAIŞê re tên desteserkirin. DYê ji bo pêşîgirtina binpêkirinên li dijî kesên ku di kampan an avahiyên binçavkirinê de ne, an jî ji bo kêmkirina giranî û mezinahiya van binpêkirinan hin çalakî pêk anîne. Lê belê, lêkolîna Rêxistina Efûya Navneteweyî nîşan dide ku tedbîrên ku hatine kirin li gor asta binpêkirinên ku tên kirin, û li gor derfet û bandora DYê qet bi têrê xuya nake.

Divê ev binpêkirin bi dawî bibin. Ya herî lezgîn jî, divê rayedarên xweser bûyerên îşkenceyê an jî tevgerên xirab û windakirina bi zorê ya kesên desteserkirî rawestînin û şert û mercên desteserkirinê yên ku bûne sedema mirinên girseyî baştir bikin. Ji bo vê yekê, divê ew demildest pabendbûna xwe ya ji bo peydakirina derfetên gehîna tam a hemû cihên desteserkirinê, hemî qismên her du avahiyên desteserkirinê jî di nav de, ji çavdêrên mafên mirovan û aktorên mirovî yên xwedî erkê parastinê re bi cih bînin.

Divê hevpeymaniya bi pêşengiya DYê bi lezgînî tevbigere da ku erkên xwe yên li gor Xala Hevpar 1 a Peymana Cenevreyê bi cih bîne û rêzdariya rayedarên xweser a ji bo qanûnên mirovî yên navneteweyî misoger bike. Divê demildest operasyonên hevbeş ên bi HSD û hêzên girêdayî wê re yên ku dibin sedema desteserkirina kesên ku bi gumana têkiliya bi DAIŞê re tên girtin, rawestînin heta ku rayedarên xweser binpêkirinên di vê raporê de hatine belgekirin çareser nekin. Her wiha divê ew derfet û bandora xwe baştir bi kar bînin da ku girtî rastî îşkence, tevgerên xirab û binpêkirinên din neyên, û divê hewl bidin ji bo baştirkirina wan şert û mercên nemirovane ku bi hezaran kes tê de ne.

Rayedarên xweser û koalîsyona bi pêşengiya DYê, bi kordînasyona li gel NYê, divê stratejiyek berfereh bi pêş ve bixin ji bo çareserkirina krîza desteserkirinê da ku ev pergala heyî ya destserkirinê rêzê li qanûna navneteweyî ya mafên mirovan û qanûna mirovî ya navneteweyî bigire.

Divê NY berteka xwe ya ji bo krîza li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bêtir xurt bike. Wekî gava yekem, divê çavdêrên serbixwe demildest û bi berdewamî li hemû cihên desteserkirinê yên li herêmê bigerin. Di nav wan çavdêran de divê saziyên NYê, rêxistinên mafên mirovan, û rêxistinên mirovî yên xwedî erkên parastinê yên taybet û xwedî pisporiya têkildarî jin û zarokan hebin.

Bi awayekî giştî jî, divê Sekreterê Giştî yê NYê serokatî û pêşengiyê nîşan bide û wê bidomîne da ku çareseriyên gerdûnî yên demdirêj ji vê qeyranê re peyda bibin. Wekî gava yekem, divê ofîsa Sekreterê Giştî li gel HSD û hevpeymaniya bi pêşengiya DYê kar bike ji bo pêkanîna pêvajoyeke vekolînê ya ji bo kifşekirina kesên li kamp û navendên binçavkirinê yên ku divê yekser bên berdan, vê yekê

jî bi balkişandineke taybet a li ser qurbaniyên tawanên DAIŞê, li jêr qanûnên navneteweyî û li gor berjewendiyên qurbaniyên bazirganiya mirovî pêk bîne.

Divê ofîsa Sekreteriya Giştî ya NYê her wisa nexşeya tawanên herî giran ên ku ji hêla DAIŞê ve hatine kirin diyar bike, hewcedarî û pêşekiyên qurbaniyên DAIŞê û yên kesên rizgarbûyî kifşe bike û rêbazeke dadweriyê ya ku dikare were bihêzkirin an jî ji nû ve were afirandin destnîşan bike. Divê ev nexşekirin li ser xebata berfireh a ku li vê herêmê ji hêla mekanîzmayên vekolînê yên Neteweyên Yekbûyî ve û ji hêla mekanîzmayên din, rêxistinên sivîl û torên danûstandinê yên kesên rizgarbûyî ve hatine çêkirin pêk were. Nexşekirin divê aliyên peywendîdar ên sereke bîne ba hev û çareyan destnîşan bike, ku ji hêla Sekreterê Giştî yê NYê ve hatine piştgirîkirin, da ku di dawiyê de berpirsên tawanên hovane yên DAIŞê hesabê kiryarên xwe bidin.

PÊŞNIYAZ

JI BO RAYEDARÊN XWESER ÊN LI HERÊMA BAKUR Û ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

AVAHÎ Û KAMPÊN DESTESERKIRINÊ

- Dawî li windakirina bi zorê, girtin û binçavkirina keyfî, îşkence û tevgerên xirab ên li navendên desteserkirinê bînin û şert û mercên nemirovane yên ku bûne sedema mirina girseyî û her wiha êş û azarên giran çareser bikin. Ji hemû endamên Hêzên Surîyeya Demokratîk (HSD) û hêzên din ên ewlehiyê re eşkere bikin ku binpêkirinên bi vî rengî dê bibin sedema berpirsiyariyê yên wekî lêpirsîna sûc û dadgehkirinê;

- Li ser hemî kiryarên îşkence û tevgerên xirab, hemî sûcên din ên li gorî hiqûqa navneteweyî û hemî binpêkirinên mafên mirovan ên giran, lêpirsînek bilez, berfireh, serbixwe û bêalî pêk bînin. Piştrast bikin ku berpirsên di nav pergala desteserkirinê de ji peywirên rayedariyê werin derxistin û eger ku delîl hebin divê werin darizandin;

- Eger hewce bike bi piştgirîya navneteweyî, ji bo hemî kesên ku rastî binpêkirinên mirovahî yên li gor qanûna navneteweyî an jî binpêkirinên giran ên mafên mirovan hatine, çareseriyeke bi bandor û tazmînatên guncaw, mafê vegerandinê, rehabîlîtasyon, razîbûn û garantiyên nedubarebûnê misoger bikin;

- Destûrê bidin çavdêr û mekanîzmayên navneteweyî yên serbixwe, ku di nav de rêxistinên mafên mirovan û aktorên mirovî yên xwedî erkê parastinê, her wiha xebatkar û pisporên girêdayî Meclîsa Ewlekariyê ya NY, Civata Giştî ya NYê, Meclîsa Mafên Mirovan a NYê û dezgehên din ên NYê hene, da ku bê astengî xwe bigihînin hemî kesên ku ji azadiya xwe bêpar in, avahiyên kampa Al-Holê jî di nav de, û rê bidin wan da ku hevpeyvînên nepenî û serdanên kontrolê yên nediyar li hemî navendên binçavkirinê bikin;

- Di encama tevlêbûna çavdêr û mekanîzmayên serbixwe yên navneteweyî de, parastina hemî kesan ji kiryarên tirsandinê, tolhildanê û çewisandinê misoger bikin;

- Ofîsekê ji bo karûbarên girtiyan, bi piştgiriya navneteweyî li gor hewcedariyê, û ji bo berpirsiyariyên din divê damezrînin an jî eger ofîsek hebe wê hêzdar bikin, û bi vê jî divê: 1) malbatan derbarê çarenûs, cih û rewşa qanûnî ya hemî kesên di zindanê de agahdar bikin û bersivê bidin hemî daxwazên heyî; û 2) agahdariyê bidin malbatan derbarê çarenûsa wan kesên ku di destê wan de mirine û derfetê bidin wan da ku termên xizmên xwe wergirin;

- Li piştgirî û pisporiya navdewletî bigerin da ku tedbîrên din peyda bikin ji bo pêşdebirina dadmendî, rastî û tezmînatê ji bo qurbaniyên DAIŞê, û bi kesên bandordar re bişêwirin. Kar û

barên rêxistinên herêmî yên ku ji bo pêşxistina ji nû ve entegrasyona kesên ku ji navend û kampan vedigerin dixebitin hêsan bikin;

- Bi awayekî cidî li ser pêkanîna efûyeke berfireh rawestin ku dê ji bo hemî kesên ku bi tawanên têkildarî terorê an tawanên din ên ku li Dadgeha Parastina Gel tên darizandin an jî mehkûm bûne, were sepandin, û wan serbest berdin eger ku piştî vekolînek berfireh diyar bibe ku delîlên heyî têrê nakin ku bi awayekî şênber gumanbar li gor qanûnên navneteweyî an sûcên giran ên li gor qanûnên navxweyî ku bi qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî re hevaheng e sûcdar bên dîtin;
- Hejmareke kêm zilamên Iraqî yên ku ji aliyê rayedarên xweser ve hatine dadgehkirin û cezayên xwe li bakur-rojhilatê Sûriyeyê derbas kirine, serbest berdin.

JIN

- Kiryarên heyî yên veguheztina jinên biyanî û zarokên wan ji kampên desteserkirinê bo navendên girtinê rawestînin, ku di hin rewşan de bi hefteyan an jî mehan, wekî beşek ji pêvajoya asayî ya veguhestina di navbera kampên Al-Hol û Rojê diqewimin;
- Veguhestina jinên biyanî ya ji kampên desteserkirinê bo navendên binçavkirinê ya ji ber sûcên îdiakirî, ku di nav de xwedîbûna têlefonên desta jî heye, ku bi qanûn û pîvanên mafên mirovan ên navneteweyî re ne sûcekî naskirî ye, teqez rawestînin;
- Piştrast bikin ku jinên ku tên veguhestin ji bo navendên desteserkirinê bikarin zarokên xwe bi xwe re bînin, ku ev tewdîr jî giringiyê dide berjewendiya zarokan;
- Piştrast bikin ku dema jinek an jî xudankerek tê girtin, wextê wan hebe û piştgirî ji wan re bê kirin da ku ji bo zarokên xwe yên ku bi xwe re naynin amadekariyên pêwîst bikin, dibe ku zarokên li kampan mane teslîmî endamên malbatê yên li derveyî kampê bikin, û dema ku zarok werin desteserkirin jî divê jin werin agahdarkirin û bikarin beşdarî hemî biryarên derbarê qenciya zarokên xwe ne bibin;
- Piştrast bikin ku hemû jinên girtî di kampan de karibin bi zarokên xwe re beşdarî hemî randevûyên bijîşkî bibin, beşdarî hevdîtinên bijîşkî yên li derveyî kampê bibin, eger ku beşdariya dêûbavan an jî xudankeran li dijî berjewendiyên zarokê nebe;
- Piştrast bikin ku jinên li kamp û dezgehên binçavkirinê bikarin li ser endamên malbatên xwe yên di girtîgehê de agahiyan werbigirin û karibin bi awayekî rêk û pêk bi wan re têkiliyan daynin;
- Bi karmendên alîkariyên mirovî yên xwedî pisporî re li ser çareserkirina tundiya li ser bingeha zayendî xebatê bikin ji bo danîn û bicihanîna pîlanek berfireh a ji bo parastina jin, keç û kesên din ên di bin metirsiya tundiya zayendî de li kampan dijîn, û, li cihê ku gengaz be, demildest yên ku li kampê di bin metirsiyan de ne û li gor qanûnên navneteweyî an jî li gor qanûnên navxweyî yên bi qanûnên navneteweyî re lihevkirî ne sûcdar nebin an jî sûceke giran nekiribin serbest berdin. Piştrast bikin ku hemî giliyên pêbawer ên derbarê tundiya li ser bingeha zayendî li kampên desteserkirin werin çareserkirin, mafên kesên rizgarbûyî werin parastin, û sûcdar jî li gor berjewendiyên qurbaniyên rizgarbûyî û li gor mafên mirovan wekî berpirsiyar werin darizandin.

ZAROK

- Bi lezgînî hemî zarokên girtî radestî malbatên wan bikin, li ku dibe bila bibe, eger ku ev li gor berjewendiya zarokan be. Ji bo zarokên ku ne xwediyê vê vebijarka bilez in, ji aktorên sivîl ên parastina zarokan piştgiriyê bigerin da ku li gor maf û hewcedariyên wan ji bo lênêrîna alternatîf an

jîyanek serbixwe saz bikin. Divê ciwanên ku wekî zarok hatine binçavkirin jî bên berdan. Her wisa:

  - Eger zarok an mirovên ciwan wekî zarok di nav vê komê de hatibin binçavkirin, an jî di pêşerojê de, bi awayekî maqûl guman çê be ku sûcên giran kiribe dema ku bi DAIŞê re têkildar bûye, hingê bi tenê di rewşên awarte de, ji bo sûcên li gor qanûna navneteweyî an sûcên şîdetê yên li gor qanûnên navxweyî ku li gor qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî, li gor pêvajo, darizandina dadmend û pîvanên dadweriya zarokan, û di pergala dadweriya zarokan de divê bê darizandin. Piştrast bikin ku tu carî darizandina zarokan ji ber têkiliya bi komek çekdar an hêzek çekdar nekin. Piştrast bikin ku zarokên ku bi komên çekdar re têkildar in di serî de wekî mexdûrên binpêkirinên mafên mirovan werin hesibandin û berjewendîyên wan wekî girîngiyek bingehîn li ber çavan bigirin;
  - Dema biryara şopandina dozeke bi vî rengî didin, temenê wan li ber çavan bigirin bê ka dema van kesan xizmet kirine çend salî bûne û dîsa li gor qanûnên herêmê, cezayê herî zêde ji bo tawanek ku di bin temenê 18 saliyê de hatiye kirin heft sal;
  - Piştrast bikin ku kesên ku di zarokatiyê de hatine binçavkirin, ne niha û ne jî di pêşerojê de li Dadgehên Parastina Gel neyên darizandin; û
  - Di kêm bûyeran de ên ku doz tên meşandin, hem alternatîfên ji bo pêvajoyên darizandinê û hem jî alternatîfên rewşa girtinê yên civakî û bêyî girtinê li ber çav bigirin, ku di nav wan de mekanîzmayên dadweriya bi armanca qenckirinê û lihevhatinê hene. Eger tedbîrên berpirsiyariya tawanan werin sepandin, vebijarkên cezakirinê divê piştgirîya rehabîlîtasyon û ji nû ve entegrasyonê ya zarokê bike, û girtin divê bi tenê wekî tedbîra dawî û ji bo dema herî kurt were bikaranîn.

- Kesên ku wekî zarok hatine desteserkirin û ji girtîgeha Panoramayê hatine serbestberdan divê bên kontrolkirin û ji bo nexweşiya weremê bên dermankirin;

- Gehîna tam ji bo aktorên têkildar ên parastina zarokan bê misogerkirin ji bo navendên binçavkirinê yên ku zarok lê têne ragirtin, û rê bidin wan ku ew bi awayekî rêk û pêk, azad û nepenî bi zarokan re mijûl bibin da ku hewcedariyên wan binirxînin û çareseriyên mayînde ji wan re bibînin;

- Demildest derxistina kurikên hemwelatiyên biyanî ya ji kampên desteserkirinê û veguhestina wan a ji bo navendên desteserkirinê rawestînin, ku di nav de navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan jî hene. Ji aktorên parastina zarokan, rêxistinên mirovî jî di nav de, piştgiriyê bixwazin ji bo pêşxistina prosedurên lênêrînê, parastinê û xizmetên ji bo hemî zarokên ku di nav malbatê de an jî li ser destên kesên din ên li kampê bi tundî û îstismarkirinê re rû bi rû ne, ji bo ku li şûna polîtîkaya veqetandinê ya heyî ya ji bo kurên hemwelatiyên biyanî çareseriyeke din peyda bibe;

- Derfetên vekolîneke serbixwe ya bi piştgirîya navneteweyî çê bikin, ji bo ku binirxîne bê ka cudakirin û derxistina kurikan û mêrên ciwan ên ku di destpêkê de wek kur li kampan hatibûn girtin, di berjewendiya wan de çê bûye yan jî na. Kurik û mêrên ciwan li gel malbatên wan ên li kampan serbest berdin eger ku bê dîtin ku derxistina wan standardên navneteweyî bin pê dike;

- Hemî veguhestinên zarokan ên ji kampên Al-Holê û Rojê ya bo navendên girtinê, navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan jî tê de, belge bikin û agahdariyan derbarê çarenivîs û cihê zarokan bidin endamên malbatên wan;

- Zarok û mirovên ciwan ên wekî zarok ku niha li navendên binçavkirinê tên ragirtin, navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan jî di nav de, kifşe bikin û wan belge bikin. Agahiyê bidin endamên malbatê derbarê cihê van zarok û ciwanan. Hejmar û cihên avahiyên ku zarok û mirovên ciwan ên ku di zaroktiyê de hatine desteserkirin ji aktorên ku bi parastina zarokan re têkildar in eşkere bikin;

- Danûstandina di navbera zarok û malbatên wan de hêsan bikin, têkiliyên bi rêya têlefonê ya bi rêk û pêk li hemî navendên desteserkirinê yên girêdayî hêzên ewlehiyê misoger bikin;

- Hemî kur an jî xortên ku di avahiyên desteserkirinê yên mezinan de tên ragirtin ji mezinan veqetin, eger ku ew endamên heman malbatê nebin an jî mayîna wan di berjewendiya zarokê de bê dîtin;

- Veguhestina kurên ku dibin 18 salî ya ji bo avahiyên desteserkirinê yên mezinan rawestînin;

- Bi piştgirîya navneteweyî û bi piştgirîya aktorên parastina zarokan, piştrast bikin ku her zarokek ku di dema operasyonên leşkerî yên berdewam de ji hêla HSDê û hêzên ewlekarîyê yên girêdayî wê were girtin, bikaribe derkeve pêşberî rayedarên hiqûqî yên ku berpirsê dadperweriya zarokan in, an jî derkeve pêşberî rayedariyeke din a sivîl ku di prosedurên dostane yên zarokan de hatine perwerdekirin, û bi vî awayî derfet bên çêkirin ji bo kêmkirina dema mayîna zarokan a di destê hêzên ewlehiyê de;

- Temenê herî kêm ê berpirsiyariya sûc ji 10 saliyê bilind bikin herî kêm 14 salî.

JI BO HIKUMETA DEWLETÊN YEKBÛYÎ Û DEWLETÊN DIN ÊN ENDAMÊ HEVPEYMENIYA BI PÊŞENGIYA DEWLETÊN YEKBÛYÎ

- Binpêkirinên din ên erkên erênî û neyînî yên Xala Hevpar 1 ya Peymanên Cenevreyê rawestînin, hemî bandor û derfetên xwe bikar bînin ji bo rawestandina binpêkirinên domdar ên qanûnên mirovî yê navneteweyî yên ji hêla rayedarên xweser û pêşî li binpêkirinên pêşerojê bigirin;

- Binpêkirinên giran ên mafên mirovan, ku di nav de mafên jiyanê û azadiya ji îşkencekirin an jî tevgerên xirab û prensîba nevegerandinê jî hene, rawestînin û ji her kesê bandordar re ku hatine veguhestin çareyek bi bandor û tezmînata bi têrê misoger bikin, û çavdêriya çarenûsa her kesê ku bi vî rengî hatiye veguhestin bikin;

- Veguhestina mêr, jin û zarokan, piştî girtin û lêpirsîna wan a li baregehên leşkerî yên di bin kontrola hevpeymaniya bi pêşengiya DYê de, ji bo HSD û hêzên din ên ewlehiyê yên girêdayî wê rawestînin, heta ku rayedarên xweser nîşan bidin ku ev kes ne di xetereyê de ne, rastî îşkence yan jî tevgerên xirab, binpêkirina mafê, yan jî binpêkirinên giran ên mafên mirovan nayên;

- Demildest hemû şêweyên hevkariyê yên bi HSD û hêzên ewlekariyê yên girêdayî wê re rawestînin, eger ku îhtimalek zêdetir hebe ku hevkariyek wiha dê ji bo pêkanîn, asankirin an jî metirsiyên binpêkirina qanûnên mirovî yên navneteweyî were bikar anîn. Bi taybetî jî, operasyonên hevbeş ên bi HSD û hêzên girêdayî wê re ku dibin sedema girtina mirovan a bi gumana têkiliya bi DAIŞê re rawestînin heta ku rayedarên xweser binpêkirinên di vê raporê de hatine belgekirin çareser bikin. Pîvanên zelal û şefaf diyar bikin da ku pê binirxînin ka rayedarên xweser serî li binpêkirinan dane an jî na, û pêşketina rewşê ya li gor berî destpêkirina hevkariyê bi raporan ji raya giştî re ragihînin;

- Hemî bandora xwe bi kar bînin da ku zorê bidin rayedarên xweser ku dev ji îşkencekirin an jî tevgerên xirab, windakirinên bi zorê, binçavkirinên keyfî, şert û mercên nemirovane yên ku bûne sedema mirina girseyî û binpêkirinên din ên ciddî yên hiqûqa mirovî ya navneteweyî û qanûna mafên mirovan a navneteweyî berdin;

- Bi awayekî diyar nerazîbûna xwe nîşan bidin derbarê veqetandina bi zorê û keyfî ya berdewam û dûrxistina kurên ciwan ên biyanî yên ji malbatên wan, bi taybetî jî ji dayikên wan, eger ku ev kiryar li gor prosedureke qanûnî ya şefaf pêk neyê û ji hêla kesên ku tên veqetandin ve li gor baştirîn pratîk û standardên navneteweyî nebe. Piştgiriya damezrandina vekolînek serbixwe bikin da ku binirxînin ka cudakirin û derxistina kur û xortên ku wek kur ji kampan hatine girtin di

berjewendiya wan de ye yan jî na. Heta ku ev pêvajo neyên destpêkirin, piştgiriya ji bo navendên "rehabîlîtasyonê" yên ciwanan rawestînin;

- Zarokên ku di operasyonên hevpar ên bi HSDê û hêzên ewlekariyê re yên girêdayî wê de hatine girtin, di zûtirîn dem de veguhezînin rayedariya ku ji dadweriya zarokan re berpirsiyar e, an jî veguhezînin rayedariyeke din a sivîl a ku di prosedurên dostane yên zarokan de hatine perwerdekirin, û maweya ku zarok li ba hêzên ewlehiyê di desteserkirinê de bimînin bi vî awayî kurt bikin;

- Demildest mekanîzmayeke bi bandor saz bikin ji bo şopandina çarenivîsa hemî girtiyên Iraqî û Saudî yên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê bo welatên xwe hatine veguheztin, û her weha rewşa hemî kesên din ên ku ji bo dewletên ku erkên nevegerandinê tên binpêkirin binirxînin;

- Li Iraqê, kordînasyonê bi "Çarçoveya Gerdûnî ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Piştgiriya Neteweyên Yekbûyî li Sûriyeyê / Iraqê ya Derbarê Kesên Vegerandî yên Welatên Sêyem " re bikin da ku piştrast bikin ku hemî girtiyên mêr ên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine veguhestin bo Iraqê tên şopandin;

- Daxwazê ji rayedarên Iraqî bikin ku dosyayên hemî mêrên Iraqî yên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê bo Iraqê hatine veguhestin binirxînin, hemî cezayên ku dadgehên Iraqî li ser bingeha "îtirafên" bi îşkenceyê hatine dayîn betal bikin û piştrast bikin ku hemû Iraqîyên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine veguhestin bi awayekî dadwerane bên darizandin û cezayê îdamê li wan neyê birîn;

- Tayînkirina koordînatorekî payebilind demildest pêk bînin ji bo çavdêriya rewşa kesên li kamp û navendên desteserkirinê yên ku gumanbarê têkiliya bi DAIŞê ne li bakur-rojhilatê Sûriyeyê û ji bo çavdêriya pêşveçûn û pêkanîna stratejiya ku li jêr hatiye diyarkirin a ku Hêza Peywirdar a NYê ya Al-Holê pêşengiyê dike. Piştrast bikin ku şertên referansê pabendbûna bi mafên mirovan û her wiha bi mafên zayendî û mafên zarokan nîşan bidin;

- Hemî nirxandinên ku di sala 2022an de hatin kirin, û nirxandina navendên desteserkirinê yên HSDê ku ji aliyê hevpeymaniya bi pêşengiya DYê ve hatiye kirin bi raya giştî re parve bikin.

JI BO WEZARETA DERVE YA DYÊ, OFÎSA ÇAVDÊRIYÊ Û ASTENGKIRINA BAZIRGANIYA MIROVÎ, KOMA XEBATÊ YA ÊZIDÎ Û HÊZA PEYWIRDAR A NETEWEYÊN YEKBÛYÎ YA KAMPA AL-HOLÊ JÎ DI NAV DE:

- Çavdêrî û raporkirina li ser rewşa qurbaniyên bazirganiyê yên li kamp û navendên desteserkirinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi berdewamî û bi awayekî berfirehtir bidomînin;

- Parêzvaniya dualî zêde bikin li gel dewletên ku hemwelatiyên wan li bakur-rojhilatê Sûriyê di kamp û navendên desteserkirinê de ne, û balû bikişînin ser erkên wan ên navneteweyî li gor qanûna navneteweyî ya dijî bazirganiya mirovî û mafên mirovan ji bo naskirin û vegerandina hemwelatiyên xwe û nîştecihên daîmî yên ku qurbaniyên bazirganiya potansiyel in, û her wiha li zarok û ciwanên ku di zarokatiya xwe de anîne bakur-rojhilatê Sûriyê xwedî derkevin. Şêwirmendiyê bikin ka dewlet çawa dikarin bi awayekî aktîf qurbaniyên bazirganiya mirovê yên di nav hemwelatiyên xwe û rûniştvanên daîmî de li bakur-rojhilatê Sûriyeyê kifşe bikin;

- Şêwirmendiyê dabîn bikin da ku mekanîzmayên vekolînê, an jî pêvajoya dadweriyê, ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatiye damezrandin, pratîkên herî baş ên cîhanî di nav xwe de bihewînin di çarçoveya şerê li dijî bazirganiya mirovî û dabînkirina mafên qurbaniyên, li ser bingeha ezmûna Ofîsê ya di çavdêrîkirin û şerê li dijî bazirganiya mirovan de a li seranserê cîhanê;

- Perwerdehiyê bidin rayedarên xweser û/an jî rêxistinên mirovî yên ku li bakur-rojhilatê Sûriyê

kar dikin li ser pîvanên navneteweyî yên têkildarî mijara bazirganiya mirovî û dabînkirina mafên mexdûran û yên rizgarbûyî.

JI BO RAYEDARÊN XWESER Û HER WISA JI BO HIKÛMETA DEWLETÊN YEKBÛYÎ, HIKÛMETA QRALTIYA YEKBÛYÎ Û DEWLETÊN DIN ÊN ENDAM ÊN HEVPEYMANIYA BI PÊŞENGIYA DEWLETÊN YEKBÛYÎ:

Bi kordînasyona li gel saziyên pêwendîdar ên NYê re, stratejiyek berfireh çê bikin ji bo çareserkirina tawanên li gor qanûna navneteweyî û binpêkirinên din ên cidî yên mafên mirovan ên ku li dijî kesên ku bi têkiliya bi DAIŞê re li navendên desteserkirinê û kampên desteserkirinê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê têne kirin. Divê ev stratejî, herî kêm, xalên jêrîn bigire nav xwe:

- Ji Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî daxwazê bikin û piştgiriya wan bikin ku pêvajoyek çavdêriya li gor mafên mirovan saz bike (ji bo hûrguliyên bêtir, li pêşnîyarên ji bo UNê li jêr binêrin);
- Piştrast bikin ku hemî kesên ku piştî kontrolkirina destpêkê di nav kamp an avahiyeke taybetî de hatine tomarkirin, xwe gihandibin parêzeran, lênihêrîna bijîşkî ji wan re hatibe peydakirin, li cihên destesrkirnê yên naskirî tên girtin û destûr ji wan re tê dayîn ku bi rêk û pêk serdana malbatên xwe bikin;
- Sîstemeke çavdêriyê ya bibandor damezrînin ji bo hemû girtiyên ku bi gumana têkiliya bi DAIŞê re di destê rayedarên xweser de ne, û bi rêya serdanên neragihandî û serbixwe yên li hemî cihên desteserkirinê çavdêriya binpêkirinên qanûna navneteweyî ya mafên mirovan û qanûna mirovî ya navneteweyî pêk bînin, li cihê ku pêwîst bike wan ragihînin. Wekî mînak, eger ku zarokek bê yî amadekariya veqetandinê li paş dêûbavan mabe, ragihandinên bi vî rengî dibe ku ji hêla rêxistinên parastinê yên ku li derveyî kampê dixebitin bêne kirin;
- Piştrast bikin ku hemû kesên di pergala desteserkirinê de tên girtin dikarin bi endamên malbatê, hezkiriyên din û parêzeran re têkiliyê deynin û bi wan re hevdîtinê pêk bînin;
- Veguhestina mirovan a ji bo beşeke din a Sûriyeyê an welatek din rawestînin, welatê wan ê jêder jî di nav de, li cihê ku ew di bin metirsiya binpêkirinên cidî yên mafên mirovan de bin, wekî binpêkirina prensîpa nevegerandinê, û rewşa her yekî jî cuda binirxînin;
- Veguhestina mêrên Iraqî û Saudî ya ji bo welatên wan rawestînin heta ku êdî sedem tune be ku em bawer bikin ku ew di bin metirsiya îşkenceyê yan jî tevgera xirab, bêparkirina ji mafê jiyanê, an binpêkirinên din ên giran ên mafên mirovan de ne. Bi hevdemî vebijarkên van kesan bi riya çareseriyên dadwerî yên ku ji hêla pêvajoya nexşeya Neteweyên Yekbûyî ve li jêr hatine destnîşan kirin vekolînin û piştgiriyê bidin wan;
- Bi UNICEFê re protokoleke radestkirinê çê bikin da ku pergal û prosedurên ji bo radestkirina zarokên ku di operasyonên leşkerî yên domdar de tên desteserkirin bibin xwedî pîvanên fermî û standart;
- Bi şêwirîna bi saziyên pêwendîdar ên Neteweyên Yekbûyî û yên bandordar re, çareseriyekê peyda bikin li gor mafên mirovan ji bo serbestberdana ji girtina keyfî ya nişteciheên Sûriyeyî yên ku nikarin vegerin warên xwe yên li herêmên di bin kontrola hikûmeta Sûriyeyê an komên çekdar de;
- Bi şêwirîna bi saziyên pêwendîdar ên Neteweyên Yekbûyî û yên bandordar re, çareseriyek li gorî mafên mirovan destnîşan bikin da ku ji binçavkirina keyfî nifûsa hemwelatiyên biyanî yên li kamp û tesîsên binçavkirinê azad bikin, yên ku nikarin bi ewle vegerin welatên xwe yên eslê xwe bêyî ku

xetera girtina wan hebe. binpêkirinên giran ên mafên mirovan. Divê ev vebijarkên nişstecihbûnê li bakur-rojhilatê Sûriyê an jî welatên sêyemîn pêk bîne.;

- Bi şêwirîna bi saziyên pêwendîdar ên Neteweyên Yekbûyî û yên bandordar re, tedbîran werbigirin ku derfetê bide qurbaniyên bazirganiya mirovî yên ku di pêvajoya kontrolkirinê de ji bo serbestberdanê hatine destnîşankirin bila li deverên bakur-rojhilatê Sûriyeyê bimînin, eger ew nikaribin vegerin deverên xwe an welatê xwe heta dema ku çûyîna wan pêkan bibe, û vê yekê jî li gor Protokola Palermo ya Pêşîlêgirtin, Tepeserkirin û Cezakirina Bazirganiya Mirovî, Bi Taybetî ya Jin û Zarokan pêk bînin;

- Prosedureke xebatê ya standard ji bo naskirina Êzdiyan û kesên ji civakên hindikahiyên din saz bikin ku ji aliyê DAIŞê ve hatine revandin û niha di pergala desteserkirinê de ne. Divê girîngiyeke taybet bê dayîn da ku tu kes li dijî îradeya xwe neyê nasnavkirin û ji kampan neyê derxistin û nekeve nav metirsiya veqetandina ji zarokên xwe.

JI BO OFÎSA SEKRETERÊ GIŞTÎ YÊ NETEWEYÊN YEKBÛYÎ

- Bi awayekî lezgîn destpêşxeriyên navneteweyî ji aliyê saziyên NYê û aktorên din ên pêwendîdar ve ji bo çareserkirina krîza desteserkirinê ya li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bi rê ve bibin. Di nav pêşekiyên din de, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî divê Hêza Peywirdar a UNê ya Al-Hol, bi Ofîsa Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a NYê (OHCHR), Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) û Ofîsa Dijî Terorîzmê ya NYê (UNOCT) têkiliyan ji nû ve xurt bike û çavdêriyê bike, çareseriyan destnîşan bike, lobî û parêzvaniyê bike da ku:
    - Pergala desteserkirinê li bakur-rojhilatê Sûriyê wekî qeyrana mafên mirovan qebûl bikin, her wisa wekî qeyrana mafên zarokan û dadmendiya zayendî jî binasin. Li pêş raya giştî nerazîbûna xwe ragihînin ku bakur-rojhilatê Sûriyeyê bûye cihê herî mezin ji bo girtina zarokan a li seranserê cîhanê, û her wisa hejmareke mezin a qurbaniyên bazirganiyê jî têne girtin, û kesên di nav pergala desteserkirinê rastî îşkencekirin an jî tevgerên xirab û şert û mercên nemirovane hatine.
    - Pêvajoyek çavdêriya li gor mafên mirovan li kamp û avahiyên desteserkirinê pêk bînin da ku:
        1) Tesbît bikin bê ka kîjan mirov bêyî sûcdarkirin an dadgehkirin hatine binçavkirin, kîjan ji ber sûcên li gor qanûnên navneteweyî an sûcên giran ên li gorî qanûnên navxweyî yên ku bi qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî re hevaheng in, werin lêpirsîn û dadgeh kirin, bê ku bibin mijara darizandinê ya ji bo cezayê mirinê; û
        2) Hemî kesên din ên ku bi awayekî keyfî li kamp û avahiyên desteserkirinê hatine girtin serbest berdin. Di vê çarçoveyê de, divê pêşî li berdana komên di xetereyê de were girtin, ên wekî zarok, pîr, mirovên ku bi giranî nexweş in, mirovên ku bûne qurbaniyên bazirganiyê û mirovên ku bi xeteraya mirinê an zirara giran re rû bi rû ne. Divê dewlet bibin alîkar da ku ew xwe bigihînin konsolosxaneyan û belgeyên sivîl ji hemwelatiyên xwe yên ku hatine berdan re peyda bikin; û
    - Piştgiriya dabînkirina dadwerî, rastî û tezmînatê bikin ji bo tawanên li gor qanûnên navdewletî yên ku ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin û dadgehkirina berpirsên tawanên hovane yên DAIŞê pêk bînin, bi rêya pêvajoyeke nexşekirinê ku dê derfetên jêr çê bike:
        1) Nirxandina hewcedariyên qurbaniyên tawanên ku ji aliyê DAIŞê ve li Iraq û Sûriyeyê hatine kirin bihewînin da ku bizanin ku rizgarbûyî çi çareseriyên dadmendî û tezmînatê dixwazin. Ev nirxandina berfirehtir divê lêkolînên ku berê ji hêla komên

rizgarbûyî, rêxistinên sivîl û aktorên din ve hatine kirin bigire nav xwe;

2) Avaniya dadweriya heyî li ber çav derbas bikin bê ka tê de sûcdarên tawanên li gor hiqûqa navneteweyî, ku tê îdiakirin ku bi DAIŞ re têkildar in, di darizandinên dadwer de, bi rêya mekanîzmayên herêmî an navneteweyî tên darizandin, û çareseriyek dadwer ji bo kesên mayî yên ku nikarin bi awayekî adîl di dadgehên heyî de werin darizandin peyda bikin; û

3) Kêmasî û derfetan ji bo xurtkirina avaniya dadweriyê û hevkariyê di nav darazan de destnîşan bikin û vebijarkên dadgehkirina tawanên li gor yasayên navneteweyî yên ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine kirin, li gor pîvanên navneteweyî lêkolîn bikin. Ev dikare avakirina pêvajoyên ji bo hêsankirina parvekirina delîlan û agahdariyên din ên têkildar ji bo darizandinan pêk bîne.

- Bi şêwirîna li gel kesên bandordar û rayedarên xweser û bi şêwirîna li gel hevpeymaniya bi pêşengiya DYê re, çareseriyek li gor mafên mirovan destnîşan bikin:

  1) Ji bo nifûsa mayî ya Sûriyeyî ku nikarin vegerin warên xwe yên li herêmên di bin kontrola hikûmeta Sûriyeyê an komên çekdar ên din de; û

  2) Ji bo serbestberdana welatiyên biyanî yên li kamp û avahiyên desteserkirinê yên ku bi ewlehî nikarin vegerin welatên xwe bêyî ku rastî binpêkirinên giran ên mafên mirovan bên. Divê ev vebijarkên nîştecihbûnê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê an jî welatên sêyemîn pêk bîne. Divê baldariyek taybetî bê dayîn da ku qurbaniyên bazirganiya mirovî yên Sûriyeyî an biyanî yên ku dixwazin li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bimînin, bi piştgiriya saziyên mirovî yên pispor karibin vê yekê bikin.

- Pêşxistina kordînasyon û hevkariyê di navbera mekanîzmayên navneteweyî yên cuda de ku ji bo Sûriyeyê û tawanên DAIŞê hatine damezrandin, di nav de Komîsyona Lêpirsînê ji bo Komara Erebî ya Sûriyeyê (Komîsyona Lêpirsîna ji bo Suriyeyê); Mekanîzmaya Navneteweyî, Bêalî û Serbixwe ya Komara Erebî ya Sûriyeyê (IIIM); Saziya Serbixwe ya Kesên Windabûyî; û Tîma Vekolînê ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Teşwîqkirina Berpirsiyarî ji Tawanên Ku ji aliyê DAIŞê ve hatine kirin (UNITAD) jî hene; û

- Danûstandineke nêzik çê bikin bi Şanderê Taybet ê Sekreterê Giştî yê ji bo Sûriyeyê, bi Nûnerê Taybet ê ji bo Sekreterê Giştî yê ji bo Tundiya Zayendî ya di Pevçûnan de, bi Nûnerê Taybet ê ji bo Sekreterê Giştî ê bi taybetî ji bo Zarokan û Deverên Aloziyên Çekdarî, bi Raportorê Taybet ê ji bo Pêşvebirin û Parastina Mafên Mirovan û Azadiyên Bingehîn di dema Têkoşîna li Dijî Terorê de, û bi Raportorê Taybet ê Bazirganiya Mirovî, Bi taybetî Jin û Zarokan, di bicihanîna van pêşniyazan de.

JI BO MECLÎSA MAFÊN MIROVAN A NETEWEYÊN YEKBÛYÎ:

- Daxwazê ji Komisyona Navneteweyî ya Serbixwe ya NYê ya Lêpirsîna derbarê Komara Erebî ya Sûriyeyê bikin da ku di lêkolînên xwe yên berdewam de li ser rewşa kamp û navendên desteserkirinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê rawestin, û bala xwe bidin ser kuştinên neqanûnî, îşkencekirin an tevgerên xirab ên neqanûnî. Veguhestina kurikan a ji bo navendên binçavkirinê û binpêkirinên din ên cidî yên dijî hiqûqa mirovî ya navneteweyî û qanûna navneteweyî ya mafên mirovan li ber çav bigirin; û di çavdêrîkirin û raporkirina berdewam a li ser bakur-rojhilatê Sûriyeyê de balê bikişînin ser mafên mirovî yên qurbaniyên bazirganiyê;

- Daxwaza raporekê ji bo Meclîsa Mafên Mirovan bikin ji raportorê taybet ê bazirganiya mirovan, bi taybetî jin û zarokan, li ser mafên qurbaniyên bazirganiyê yên li bakurê rojhilatê Sûriyeyê di nav pergala desteserkirin û darizandinê de ne.

JI BO SAZIYÊN DIN, SEKRETERIYA NETEWEYÊN YEKBÛYÎ Û FON, DEZGEH Û BERNAMEYÊN GIRÊDAYÎ WÊ:

Saziyên xwedî erkên mafên mirovan an jî erkên parastinê, yên ku pisporiya wan bi zarok û jinan re têkildar in jî di nav de, divê:

- Daxwaza gihandinê bikin ji bo hemî cihên desteserkirinê yên kesên ku bi têkiliya bi DAIŞê re tên girtin li bakur-rojhilatê Sûriyeyê û Iraqê, û daxwaza ji bo pêkanîna hevpeyivînên nehênî bikin li ser fikarên derbarê binpêkirinên qanûna navneteweyî ya mafên mirovan û qanûna mirovî ya navneteweyî.

Nûnerê Taybet ê Sekreterê Giştî yê derbarê Tundiya Zayendî ya di Aloziyan de divê:

- Bi taybetî bala xwe bidie rewşa kesên ku dibe ku bi armanca zewaca bi darê zorê, koletiya seksî, an cûreyên din ên tundiya zayendî ya girêdayî aloziyan hatibin firotin, ku di kamp û navendên desteserkirinê de li bakur-rojhilatê Sûriyeyê dimînin, û parêzvaniya takekesî û giştî dabîn bike;
- Divê kêşeyên têkildarî pêwîstiyên parastina hiqûqî di asta giştî û taybet de çareser bike ji bo kesên ku bêyî sûcdarkirin an dadgehkirin li kamp û navendên desteserkirinê li bakur-rojhilatê Sûriyeyê tên girtin;
- Bi Tîma Pisporên Serweriya Qanûnê û Tundiya Zayendî ya di Aloziyan de, pisporiya teknîkî peyda bikin ji bo piştgirîkirina pîlan û destpêşxeriyên hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û rayedarên xweser û saziyên din ên Neteweyên Yekbûyî ji bo misogerkirina mafên mexdûrên bazirganiyê yên desteserkirî û nav pergala dadweriyê.

Fona Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) divê:

- Bi armanca afirandina mekanîzmayên parastinê bi aktorên parastina zarokan re, rêxistinên mirovî û dezgehên kartêker jî di nav de, kar bike ji bo pêşxistina prosedurên lênêrînê û parastinê ji bo hemî zarokên ku di nav malbatê de an jî li ser destên nişstecihên din ên kampa binçavkirinê bi tundî û îstîsmarê re rû bi rû ne. Siyaset û pratîkên ku hatine pêşxistin divê li şûna tewdîrên heyî yên veqetandina xortên biyanî ya ji kampan bigire, da ku balê bikişîne ser parastina zarokan, û ji hêla baştirîn ve berjewendiyên zarokan bên parastin;
- Daxwaza xwe bigihîne hemî cihên desteserkirinê yên ku niha zarok lê tên ragirtin û derfeta destûrê wergire da ku bi awayekî rêk û pêk, azad û nepenî bi hemû zarokan re mijûl bibe. Bi dezgehên kartêker û aktorên mirovî re xebatê bike da ku ji bo zarokên girtî dosyayên kesane saz bikin û wan ji vegerandina ewle û dilxwazî an jî derbarê çareseriyên mayînde agahdar bikin;
- Bi hemû aktorên parastina zarokan re bixebite ji bo pêşxistina rêyên ji girtîgehê ji bo hemû zarokan li ser bingeha nirxandinên takekesî û lêgerîna alternatîfên lênêrînê û ji nû ve entegrasyonê ku rêzê li mafên zarokan digirin; û
- Protokolek radestkirinê bi rayedarên xweser û koalîsyona bi pêşengiya DYê re çê bikin da ku bi lezgînî zarokên ku di operasyonên leşkerî yên domdar de rastî wan tên veguhezînin ji bo dezgehên piştgiriyê û yên entegrasyonê yên guncaw.

Nûnerê Taybet ê Sekreterê Giştî yê ji bo Zarokan û Pevçûnên Çekdarî divê:

- Ji bo serbestberdana zarokên ku di kampan û navendên desteserkirinê de tên ragirtin, bi rayedarên xweser re parêzvaniyê bike;
- Parêzvaniyê bike li gel welatên biyanî ku zarok hemwelatiyên wan li kamp û avahiyên desteserkirinê ne, û her wisa ji bo mêrên ciwan ku di dema girtina xwe de zarok bûn, ji bo vegerandina wan a li gor berjewendiyên wan ên herî baş;
- Lîstekirina HSDê ji Sekreteriya Giştî re pêşniyaz bikin ji ber binpêkirinên giran ên ku li dijî zarokên di desteserkirinê de hatine kirin, heke têr be, agahdariyên piştrastkirî yên derbarê van binpêkirinan ji hêla Hêza Peywirdar a Welat a Çavdêrî û Raporkirinê ve tê dabînkirin.

Hêza Peywirdar a Welat a Çavdêrî û Raporkirinê divê:

- Binpêkirinên potansiyel ên giran ên ku li dijî zarokên girtî tên kirin raçav bike, revandin û nehiştina gihandina alîkariya mirovî ya li girtîgeha Panorama jî di nav de.

Ofîsa Dijî Terorê ya Neteweyên Yekbûyî (UNOCT) û UNICEF divê:

- Bi hevkariya OHCHRê re, wekî beşek ji "Çarçoveya Gerdûnî ya Neteweyên Yekbûyî ya ji bo Piştgiriya li Sûriyeyê / Iraqê ya Derbarê Kesên Vegerandî yên Welatên Sêyem", bi lezgînî piştrast bike ku mêr û kurên ku ji navendên desteserkirinê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê bo Iraqê têne veguhestin, ji hêla çavdêrên navneteweyî yên serbixwe ve werin ziyaret kirin, û bi hukûmeta DYê û rayedarên xweser re hevkariyê bike da ku bûyerên îşkenceyê an jî tevgerên xirab, an jî binpêkirinên din ên giran ên mafên mirovan nîşan bide.

JI BO ALÎKARAN

- Piştgiriyan berdewam û berfireh bikin ji bo civakên li seranserê bakur-rojhilatê Sûriyeyê yên ku ji şerê çekdarî yê ku tê de DAIŞê bandor li wan kiriye, û piştgiriyê bidin ji nû ve entegrekirina kesên ku ji kamp û dezgehên binçavkirinê vedigerin;
- Piştgiriya ji bo belgeyên medenî yên nû yan jî li şûna wan ji bo girtiyên serbestberdayî yên ku êdî xwe negihînin belgeyên xwe yên sivîl, wekî beşek ji pêvajoya hêsankirina vegerê;
- Teşwîqkirin û piştgirîkirina saziyên Neteweyên Yekbûyî ji bo ku li bakur-rojhilatê Sûriyeyê rolek çalaktir di şopandina cihên desteserkirinê de bigirin;
- Saziyên Neteweyên Yekbûyî û rêxistinên mirovî yên din teşwîq bikin û piştgirî bidin wan da ku destegê bidin malbatên kesên ku hatine desteserkirin, ku di nav wan de zarokên ku bêyî çavdêriya mezinan an xudankerekî hatine hiştin piştî ku dê û xudanên wan hatine girtin;
- Ji nêzîk ve bi aktorên mirovî re kar bikin li ser çareserkirina tundiya li ser bingeha zayendî li bakur-rojhilatê Sûriyê ji bo çareserkirina sedemên bingehîn ên tundiya zayendî ya li kampan, peydakirina piştgiriya armanckirî ji kesên di nav metirsiyê de, û piştrast bikin ku hemî sektorên mirovî bi têra xwe fikarên têkildarî tundiyê li ber çav digirin. Bi pisporên tundiya li ser bingeha zayendî û xebatkarên tenduristiyê re bixebitin da ku ji her kesê li kampan re lênihêrîna tenduristiya zayendî û zêdebûnê ya berfireh dabîn bikin;
- Piştgiriya aborî ji bo destpêşxeriyên ji bo naskirin, sewqkirin û piştgirîkirina rizgarbûyên bazirganiya mirovî li kamp û avahiyên binçavkirinê peyda bikin, û bi awayekî çalak bixebitin da ku piştrast bikin ku ev

ranêzikî li gor mafên mirovan rizgariyê dixe navenda xwe;

- Fonên pêwîst peyda bikin ji bo bersivdayîna mirovî ya ji bo zarokan, lênihêrîna bijîjkî ya bilez û bihêzkirina kapasîteya aktorên parastina zarokan jî di nav de, ji bo zarokan piştgirîkirina rêyên derketinê yên ji navendên binçavkirinê;

- Fonan dabîn bikin ji bo rêxistinên mafên Ezdiyan û yên din ên ku ji bo misogerkirina vegera li gor mafên mirovan a mirovên Êzdî û civakên hindikahiyên din ên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê dixebitin; ji bo danasîna Êzdiyên ku di zarokatiyê de hatine revandin, piştgiriyê bidin gihandina testa DNAyê; bi awayekî çalak tevbigerin û bibin çavdêr da ku ew nebin alîkar ku kesên Êzdî an jî yên ji civakên hindikahiyên din bên naskirin û li dijî daxwaza wan ji kampan bên derxistin, jin û zarokên wan bi darê zorê ji hev bên veqetandin, an mafên wan ên din ên mirovî neyê binpêkirin; û ji bo Êzdiyan û endamên civakên hindikahiyên din ên ku vedigerin bakurê Iraqê, çavdêrîkirinê û ji nû ve entegrasyonê piştgirî bike;

- Pisporên darayî û teknîkî pêşkêşî kom û torên rizgarbûyî yên tawanên DAIŞê yên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê û bakurê Iraqê bikin.

JI BO HIKÛMETA SÛRIYEYÊ

- Destûrê bide alîkariyên mirovî bê astengî bigihîjin ji bo bakur-rojhilatê Sûriyeyê, ji bo ku, di nav armancên din de, dayîna piştgiriyan hêsan bike ji bo kesên ji kamp û navendên desteserkirinê û civakên mêvan ên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine berdan;

- Rêwîtîya xebatkar û karmendên NYê û pisporên serbixwe hêsan bike da ku biçin bakur-rojhilatê Sûriyeyê, rê bidin wan ku çavdêrî bikin an pisporiya teknîkî an jî desteka operasyonê pêşkêş bikin ji bo çareserkirina fikarên derbarê binpêkirinên qanûna navneteweyî ya mafên mirovan û qanûna mirovî ya navneteweyî;

- Piştrast bike ku tu kesê ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê vegeriyaye rastî îşkence û tevgerên xirab, an jî binpêkirinên din ên mafên mirovan ên giran nebe.

JI BO HIKUMETA IRAQÊ

- Îşkencê an jî tevgerên xirab, darizandinên nedadperwer û bikaranîna cezayê îdamê li dijî kesên ku gumana têkiliya wan bi DAIŞê re heye rawestînin, kesên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê bo Iraqê hatine veguhestin jî di nav de;

- Piştrast bikin ku çavdêr û mekanîzmayên navneteweyî yên serbixwe, rêxistinên mafên mirovan û aktorên mirovî yên xwedî erkê parastinê jî di nav de, bikarin serdana navendên desteserkirinê li Iraqê ku zilamên Iraqî yên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyê hatine veguheztin li wir hatine girtin bikin û destûr ji wan re bê dayîn ku hevpeyvînên nehênî bi wan re pêk bînin. Her wiha divê serdanên teftîşê yên nediyar jî bikarin bikin. Ji bilî wan, piştrast bikin ku hevpeymaniya bi pêşengiya DYê an jî welatên endam ên takekesî karibin çavdêriya rewşa kesên ku ji bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatine veguhestin bikin, li gor fikarên vegerê yên ku di vê raporê de hatine destnîşankirin;

- Leza vegerandina bi dilxwazî zêde bikin ji bo zarokên li bakur-rojhilatê Sûriyeyê desteserkirî (an jî yên ku di zarokatiyê de hatine desteserkirin), xudanên wan û kesên ku dibe ku hatine firotin. Piştrast bikin ku zarok (an kesên ku di zarokatiyê de hatine desteserkirin) û rizgarbûyîyên bazirganiyê (tevî zarokên ku hatine firotin) di nav kategoriya xwedî pêşekî ya ji bo vegerê bên destnîşankirin û alîkariya guncav bistînin;

- Hevkariyê bi hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û rayedarên xweser ên bakur-rojhilatê Sûriyeyê re bikin di pêkanîna prosedurên standard ên xebatê de, ji bo misogerkirina vegera endamên Êzdî û civakên hindikahiyên din ên ku dixwazin vegerin Iraqê, li gorî mafên mirovan ku vedigerin;
- Piştrast bikin ku kesên ku vedigerin civakên li Iraqê piştgiriyek têr ji wan re were dayîn da ku entegrebûna wan hêsan bike, û piştgirî ji van civakan re misoger bikin da ku vegerên wiha hêsantir bibin.

JI BO DEWLETÊN DIN ÊN KU WELATIYÊN WAN AN JÎ NIŞTECIHÊN WAN ÊN DAÎMÎ LI SÛRIYEYÊ NE

- Ji bo vegera bi dilxwazî ya zarokan, xudanên wan, û kesên dema ku yekem car ji aliyê rayedarên xweser ve li bakur-rojhilatê Sûriyeyê hatin girtin zarok bûn (û ji wê demê de "mezin bûne") derfetan çê bikin, li gor pêwîstiya nevegerandinê, û li gor berjewendiyên zarokê. Di dema vegerê de sewqên pêwîst û piştgirîya ji nû ve entegrasyonê misoger bikin. Pêdiviyên qeydkirinê ji bo hemwelatiyên ku zarokên wan li Sûriyeyê ji dayik bûne sivik bikin da ku vegerandina wan pêk were û pêşî li bêwelatîbûnê bigire. Pêvajoyek ji bo bicihkirina zarokên bêkes û bê dewlet li bakur-rojhilatê Sûriyeyê ava bikin û piştgiriyê bidin vê yekê;
- Vegerandina bi dilxwazî ya hemwelatiyan û ya yên ku mafê wan ê rûniştina daîmî heye û mexdûrên potansiyel ên bazirganiya mirovî hesan bikin, û sewqên pêwîst bikin, piştgiriya ji nû ve entegrasyonê misoger bikin. Bi awayekî çalak li hemwelatî û nişтecihên daîmî yên ku qurbaniyên potansiyel ên bazirganiyê ne bigerin û pêvajoyeke navend-rizgarkirin, agahdarbûna bi trawmayê û pêvajoyên li gor mafên mirovan bimeşînin;
- Bi hemî pêvajoyên li gor mafên mirovan hevkariyê bikin da ku kesên ku di kampên desteserkirinê de an avahiyên desteserkirinê de bên "çavdêrîkirin" û karibin wan kesên ku bi awayekî pênebawer bi kiryarên ku wekî tawanên li gor qanûnên navneteweyî an sûcên tundiyê yên li gor qanûnên navxweyî tên sûcdarkirin werin berdan. Piştrast bikin ku hemwelatiyên ku piştî pêvajoyeke wiha ya vekolînê hatine berdan bikarin vegerin welatê xwe, dabînkirina alîkariyê ya ji bo gihîştina konsulxaneyê û belgeyên sivîl jî di nav de.

Rêxistina Efûya Navneteweyî tevgereke gerdûnî ya ji bo mafên mirovan e. Dema ku neheqî li mirovekî bê kirin, ew me hemiyan eleqedar dike.

BI ME RE TÊKILIYÊ ÇÊ BIKIN

info@amnesty.org

+44 (0)20 7413 5500

BEŞDARÎ AXAFTINÊ BIBIN

www.facebook.com/AmnestyGlobal

@Amnesty

ENCAM

NEDADWERÎ, ÎŞKENCE Û MIRIN LI BAKUR-ROJHILATÊ SÛRIYEYÊ

Rayedarên xweser ên bakur-rojhilatê Sûriyeyê – bi alîkariya hikûmeta DYê û endamên din ên hevpeymaniya ji bo têkbirina Dewleta Îslamê (DAIŞ) – mafên bi qasî 56,000 mirov, jin û zarokên ku desteser kirine bi awayekî sîstematîk û berfireh bin pê kirine. Piraniya wan mirovan piştî şerên dawî yên bi DAIŞê re yên di 2019an de hatine desteserkirin. Ew niha li kêmtirîn 27 avahiyên desteserkirinê û du kampên desteserkirinê dimînin û rastî girtinên keyfî û nediyar, windakirina bi darê zorê, şert û mercên nemirovane û binpêkirinên din ên giran tên. Gelek ji wan kesên desteserkirî qurbaniyên hovîtî û bazirganiya mirovan a bi destê DAIŞê ne.

Lêkolîna vê raporê navbera Adara 2022yan heya Sibata 2024an pêk hat û di vê çarçoveyê de sê serlêdan çê bûn ji bo bakur-rojhilatê Sûriyeyê. Bi giştî, Rêxistina Efûya Navneteweyî li gel 314 mirovan hevpeyvîn çê kir, ku di nav wan de 126 mirovên ku li avahî û kampên desteserkirinê bi têkiliya DAIŞê re tên girtin jî hebûn.

Rayedarên xweser divê demildest dawî li hemî îşkence an jî tevgerên xirab bînin û şert û mercên nemirovane çareser bikin ku bûne sedema mirinên girseyî. Hikûmeta DYê divê çi ji destê wê tê bike da ku wan binpêkirinan rawestîne. Rayedarên xweser, hevpeymaniya bi pêşengiya DYê û Neteweyên Yekbûyî divê stratejiyeke berfireh çê bikin ji bo ku ev sistema radestkirinê li gor qanûna navneteweyî serast bibe û ji bo qurbaniyên DAIŞê dadwerî were misogerkirin.

Pêrist: MDE 24/7752/2024
APRIL 2024

amnesty.org

AMNESTY INTERNATIONAL